


## ‘Ellah Mezar e’

Min cara yekê strana ‘Ellah Mezar e’ ji jina kurd a Xorasanî Xangulê ku wek dayika stranên Xorasanê jî tê nasîn, guhdarî kir. Her cara ku vê stranê guhdarî dikim, dîsa heman hestan dijîm. Dengê wê min ber bi rêwîtiyek bêrawest ve dibe... *Zehra Mohammedzadeh / R.2*




## Desthilatdarî nêr e

Desthilatdar-î nêr e, nêrbûna xwe di her şêwazê de didarîn e. Desthilatdar dikeve her rengî, rûyê desthilatdar tune ye. Ji bo desthilatdarîyê tenê tiştek girîng e, ew jî berdewamkirina hebûna desthilatdarîyê ye. Foucault dibêje: Desthilatdarî li her derê ye... *Çorê Arda / R.5*



## Tovên firengên bejî

Em kurd jî weke tovên firengê bejî ne, bi rastî jî. Trajediyên me jî bi qasî nifûsa me ne. Behsa 40-45 milyon nifûsa kurdan tê kirin lê kurd li her derî her roj û kêliyan tên kuştin. Mêtingeriya li ser axa Kurdistanê her roj dibe sedema trajediyên nû... *Derya Ozdemîr / R.12*


Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

20 - 26 Tîrmeh 2020
Hejmar: 31
Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org


# Bêdeng neman




Li Şirnexê çawişê pispor ê bi navê A.A. dest dirêjî zarokeke 13 salî kir. Zarokê xwe bi zorê ji dest çawişê pispor A.A. xelas kir û serpehatiya xwe ji malbata xwe re vegot. Li gundê Hemdûna yê navçeya Qubînê ya Elihê çawişê pispor ê bi navê M.O. zaroka 17 salî ya bi navê Î.P. bi rojan desteser kir û tecawizê wê kir. Zarokê xwest xwe bikuje û piştre bûyer ji dayika xwe re vegot. Ji dayika xwe re gotiye, “Ez bêdeng nemam lê kes dengê min nebihîst.” Gel li hemberî tecawizan bêdeng nema, daket kolanan û bertek nîşan dan... *RÛPEL - 3*

## Fermana spî!

Salvegera 6’emîn a fermana 73’an nêz dibe. Lê lîstik û plangeriyên metirsîdar jî li ser Şengal û êzidiyan didomin. Şeş sal berê bi destê DAIŞ'ê ku li ser zibilgeha zilhêzan derketî, fermaneke hovane pêk hat. Di sedsala 21’emîn de mirov bi saxî xistin gorên komî, hatin şewitandin û li bazaran hatin firotin! Niha jî li hemberî Şengal û êzidiyan plangeriyeke metisîdar dixin dewreyê... *Mem Avba / R.6*

## Sînemaya kurdî xwedî pêşerojek bihêz e

Derhênerê kurd Kazim Oz pirsên rojnameya me bersivandin û diyar kir ku sînemaya kurdî xwedî pêşerojeke bihêz e û wiha axivî: “Li rojavayê Kurdistanê di warê çand û hunerê de kedek pîroz tê dayîn. Di encama vê kedê de hinek berhemên hêja jî derdikevin holê. Hin tişt hene û bi xwe re tiştekî dilivînin lê hîna bi liv û tevger nebûye. Bandora sînemayê gelekî bi hêz e. Belkî ew nikaribe bi serê xwe an jî rasterast bindestîyê ji holê rabike. Lê bandora wê di şerê xweparastinê, şiyarbûnê û avakirana hişmendiyek nû de roleke gelek girîng dikare bilîze. Sînema di tarîyê de dikare bibe fener.”... *Hevpeyvîna Bêrîvan Kayi / R.4*



## “KORERÊ” Rêyeke Dûr...

Brahîm Ronîzer, di hemû kurteçîrokên KORERÊ’yê de olana tevzîyên civakeke bêdeng neqlî kerrika guhê xwîneran dike. Nivîskar, bêyî xwîneran aciz bike, bi zimanekî henûn û comerd gerdûna çîrokên xwe bexşî xwîneran dike. Di gelek çîrokan de, bi kod û şîfreyan bala xwîneran disû û dibe ser “ewa dîtir.” Helbet gava vê yekê dike nahêle xwîner bi zehmetîyan biêşe... Di çîroka pêşîn “Rêka Dibistanê”... *Sîdar Jîr / R.5*

**Xwe ji bo êrîşên nû amade dikin** — Felemez Ulug / R.7

## Strana me ya kurdistanî

Homeostasis têgeheke bîyolojîyê ye. Mirov dikare jê re pergala yeksengiyê jî bêje. Wexta ku di derdora hucreyan de tiştên neyînî biqewimin, hucre li hemberî wê neyînîyê xwe diparêze. Şert û mercên derdorê çiqas biguherin jî hucre ji bo berdewamiya jiyîna xwe hewl dide ku rewşa xwe ya heyî biparêze. Balkêş e ku Spînoza di pirtûka xwe ya Etîkê de: Ku dor bi dor bi rêbaza ciyometriyê ve hatiye îspatkirin... *A.Menaf Can / R.8*




## Kovara zanist û erdnîgariyê

Berpirsê kovara Parzemînê Weysel Karabulut got ku bi kurdî xebatên li ser zanist û teknolojiyê kêm in û armanca xebatên wan a sereke, belavkirina hişmendiya zanistê ya bi zimanê kurdî ye... *RÛPEL - 11*

## Bedelîyayiş û etîkê kaosî

Gelo Corana bişo dinya bedelîyayişêko radîkalî bivirazo? Gelo semeda ke potansîyel û qudretê Vîrusê Corana esta ke dinya biageyrîno destpêka xo? Zîzek nuşteyêke xo de vatibi “na çoreyî bibo sedemê peynî amêyişê kapitalîzm û sîstemê dinya bibo kominîzm”. Sebaretê no tesbîtê Zîzek mûqaşeyî hama zî ha dewam kenî... Goreyê mi, hem qudretê Vîrusê Coranayî çîn o ke dinya biageyrîno destpêka xo hem zî nêşo dinya de bedelîyayişêko radîkalî bivirazo... *Welat Ramînazad / R.9*

## Kirmanc û Kurmanc, Kirmanciyê û Kurmanciyê

Soranên Başûr ji Kurmancên Başûr ra dibêjin Behdînî. Soranên Rojhilat ji Kurmancên Rojhilat ra dibêjin Şikakî/Celalî. Lê Behdînî ji xwe ra dibêjin Kirmanc, Şikakî/Celalî dibêjin Kurmanc. Kurdên Xorasanê bo xwe peyva Kurmanc bi kar tînin û di proseya nû da bo welatê xwe dibêjin Kurmancîstan... *Selîm Temo / R.11*



# Xafikên şîrkî û kitanên spî

Navenda Nûçeyan

Çanda kitanê çandeke ku tenê li navçeyên Mêrdînê Dêrika Çiyayê Mazî û Qoserê heye. Ev awayê girêdanê bi sedan salan in li vê herêmê bi vê şêweyê berdewam e. Ev çand hem di nav kurdan de hem jî di nav çanda ermenên li Mêrdînê de heye.

Tê zanîn ku dîroka desmalê ango serîpêçanê dîrokeke kevnar e. Li gorî agahiyên hin lêkolîneran, desmal di dîroka Rojhilata Navîn û yewnanî de jî xwedî wateyeke cuda ye. Desmal xwedî wateyeke rêzdarî û dewlemendiyê ye. Lê bi dîroka sumeran re (Zagonên Hamurabî) ev wateya rêzdariyê diqulibe wateya 'namûs, henûnî, milkê mêr'. Bi dîroka olên yekxwedayî re jî, her diçe wate diguhere û dibe sembola bi taybetî îslamiyetê. Helbet armanca me ne ew e ku em qala dîroka desmalê ango serîgirtinê bikin. Bi taybetî di vê nivîsê de me bi hin jinên Dêrikê re li ser girêdana kitanên Mêrdînê, axivîn.



**Biskên di bin kitanê de**

Girêdana kitanê em li navçeyên Mêrdînê bi taybetî jî li Dêrik û Qoserê dibînin. Çandeke ku bi sedan salan in li ser vê axê jiyaye û hê jî dijî. Li gorî agahiyên hin jinên li Dêrikê didin me, tenê jinên ku dizewicin dest bi girêdana kitanê dikin. Helbet di hin gotinên dayikan de hesta olê jî heye lê aliyê vê girêdanê ya herî girîng jî aliyê wê yê çandî ye. Kitan, li Dêrikê perçeyek wek çandeke kurdewariyê ye. Bi taybetî jî jinên ku nû dizewicin li ser kitana dirêj û spî, hibriya rengê şîrkî ango şarê girê didin, biskek porê xwe di ber xafikê de diderînin û li ser hibriyê (xafik) jî ristikek zêr girê didin. Hewce ye ji her du aliyên kitanê ve biskên por derkevin. Jinên li ser 40-50'î saliya xwe dikevin kitanê, hê sadetir û bi hibriyeke reşbelek bi kar tînin. Hem di zêdebûna kumaşê kitanê de hem jî di sadebûna wan de mirov dikare bêje ku asta tecrûbeya jinê û rêzdariyê jî heye.

**Wateya kitanê**

Peyva 'kitan' ji qumaşê wê (keten) tê. Her kitanek ji metreyek û nîv qumaşî pêk tê. Xafika li ser tê girêdan jî ji pembû çêdibe. Ne di qumaşê kitanê de ne jî di yê xafikê de naylon tune ye û topê qumaşên kitanan jî ji Sûriye, Îran û Misrê tê.

Şêweya şar û kofiyê li aliyê Mêrdînê dibe wekî xafik ango hibrî û li ser kitanê tê girêdan. Piranî jinên li Dêrika bi sedan salan e ku vê şêwaya girêdanê bi kar tînin. Di her fotografeke dayikekê de wêneyên beriya 70-80'ê sal berê yên dayikan ku kitan di ser fîstanekî dirêj de li xwe kirine, hene. Yek ji van jinan jî Hemdiye Gurhan e ku ji 17 saliya xwe ve terzîtiya kitanê dike.

Hemdiye Gurhan 78 salî ye û ji 17 saliya xwe ve terzîtiya dike. Hê jî li Dêrikê dikana wê ya terzîtiyê heye û tenê cil û bergên jinên di temenê xwe de didirûn û kitan û hibriyan difiroşe. Dayika Hemdiye der barê bikaranîna qumaşê kitanê de ev tişt anî ziman: "Ji zaroktiya xwe ve hema bêje ez terzîtiyê dikim. Pêşiyên me kitan didan serê xwe. Çawa ez zewicîm, min kitana xwe ya ku qumaşê wê ji min re ji Sûriyeyê hatibû min da serê xwe, xafika xwe ya rengê şîrkî li ser kitanê girê dida. Wê demê ristikek zêrik jî min diavêt ser xafika şîrkî."



Kitan, li Dêrikê perçeyek wek çandeke kurdewar e. Bi taybetî jî jinên ku nû dizewicin li ser kitana dirêj û spî, hibriya rengê şîrkî ango şarê girê didin, biskek porê xwe di ber xafikê de diderînin û li ser hibriyê (xafik) jî ristikek zêr girê didin





**Kitanên ermen û suryanan**

Li gorî agahiyên ku dayika Hemdiye dide me, ji jinên ermenan heta yê suryanan jî li Dêrikê kitan dane serê xwe û ev tişt parve kir: "Ev adetekî ye û hê dayikên me kitan didin serê xwe. Ev 60 sal in ku ez li Dêrikê kitan û xafikan difiroşim û fîstanê dirêj didirûm. Ji jinên ermen û suryanan re jî min cil dirûtine û kitan firotine wan."

Her wiha hêjayî gotinê ye çanda kitanê ku yek ji çanda herî kevnare ya cil û bergên jinên kurdan e, bûye mijara stran û nivîsên wêjeyî jî.

---



Zehra Mohammedzadeh

## 'Ellah Mezar e'

Gelek stranên biêş û xemgîn ên qala serpêhatî û qirkirina gelê kurd li Xorasanê dike, hene. Nemaze behsa bûyer û talan, qirkirin, êş û windakirin, ango revandina jinan dike; ku ev bûyerên biêş û trajîk heya dema Qaçar diçin û jixwe ev serdem ji bo gelê herêmê wek demên bixwîn û şer jî tên pênasekirin; dîroka zindî, hafizeya mirovahiyê ji ev bûyer bi vî rengî tomar kiriye.

Her straneke wan xwedî felsefeyek kûr e. Bi awayek herî baş bûyerên ku di serê wan re derbas bûne vedibêjin. Resen in. Ger ji wê demê heya roja îroyîn ji hêla kesên cuda ve ev stran hatibin xwendin jî, tiştek ji xwe kêm nekirine...

Ew êş û bûyerên hatine jiyîn, wisa hatine rêzkirin û şirovekirin ku dema mirov îro jî guhê xwe didê, mirov heman hest, keder û êşê dijî… Mîna ku ew bûyer îro hatiye jiyîn, hesteke wisa di kes de dide avakirin, hîsên mirov bi yek caran dixe tevgerê û mirov ber bi deryayek kûr a hestan ve dibe.

Belê strana 'Ellah Mezar e' jî yek ji wan stranan e ku xwedî bandoreke cihê ye. Min cara yekê ev stran ji jina kurd a Xorasanî Xangulê ku wek dayika stranên Xorasanê jî tê nasîn, guhdarî kirin. Her cara ku vê stranê guhdarî dikim, dîsa heman hestan dijîm. Dengê wê min ber bi rêwîtiyek bêrawest ve dibe. Xwe di vê rêwîtiyê de winda dikim!.. Li pey deng û qêrîna jinan diherikim û xwe di wechê zarokan de daliqandî dibînim.

Li gorî min kes wek wê wiha zîz û zelal nikare strana 'Ellah Mezar e' wiha xweş, dilşewat û bi dengekî zîz bêje. Nizanim! Dibe kesên din jî xweş gotibin lê belê di dengê wê de tiştek din heye ku mirov bixwe re kûr û dûr dibe, di dil de rê li dengvadanekê vedike ku pênaseya wê kêmek zehmet e.

Ji bo ku mirov hîn baştir vê stranê û bandora wê fêm bike, ez dixwazim kêm be jî ji we re hinekî behsa rastiya ku ev stran pêk aniye bikim.

Heyam heyama Qaçar e. Û di vê heyamê de talanker li bakurê Xorasanê belav bûne, nexasim li herêma ku kurd lê xwecih in zêde bûn. Jixwe ji ber provakasyonên Rûsyaya Çar, ewlehiya herêmê diket xetereyê û kesê nedikarî li herêmê di nav aramiyê de rêwîtiyê bike. Komek ji talankeran jî ji wî aliyê sînor dihatin û êrîşê gelê bakurê Xorasanê, xasma parêzgeha ku kurmanc lê diman dikin. Yên dikuştin jixwe dikuştin lê yên dîl digirtin jî; mêr, jin û zarok jî di nav de, hemû dibirin bazarên koleyan ên Xeywe û Bixwara û li wir difirotin.

Di êrîşeke talankeran de jinek ciwan ku nû bi ciwanek ji eşîra xwe re desgirtî bûbû û ev her du evîndarên hev bûn, dîl dikeve destê wan. Ev jina ciwan li xerîbî û dûrî ji kes û nasên xwe, bi taybetî ji dûriya evîndarê xwe ewçend digirî ku her du çavên xwe ji dest dide. Roj nîn e ku dengê wê li esîmanan olan nede. Kêlî nîn bû ku hawar û qêrînên wê agir bi pêsîran nexe û hezar reşke çavan bi du xwe de nerêje.

Dem derbas dibe û rojek ji rojan ciwanên vê êlê êrîşî talankeran dikin, di encama vê êrîşê de jina ciwan jî rizgar dibe û dîsa vedigere nav êla xwe. Ew ê di heman kêliya ku kêfxweşiya azadiyê dijiya pê bihesiya ku evîndarê wê di êrîşa talankeran de hatiye kuştin. Ev êş jî wê bi ser hemû êşên wê de bihatina xwarê û hawar bi dilê wê yê şikestî bixista. Hawarek ku ev demdirêj bû di sînga wê de olan dida. Jina ciwan a kor, wê piştî bihîstina vê bûyerê û ji êşa dil dîn û har bibe. Wê bi aramî li dora xwe binêre û bala wê yekser diçe ser îxtiyarekê ku li ber dîwar rûniştiye, hûr û kûr difikire. Ew ê ji îxtiyar gora evîndarê xwe bipirse, îxtiyar weke ku bi salan be daqoltê bîrek bêbinî bibe, ji nişka ve vedicinice û çavên xwe li ser wech û çavên jina ciwan digerîne… Henaseyek kûr dikişîne, bi peyvên bijare dibersivîne û jê re dibêje; 'ger tu evîndarek rastîn bî, tu yê xwe bixwe gora evîndarê xwe bibînî.'

Jina ciwan ku ji ber êşa evînê çavên xwe jidest dabûn, di heman kêliyê de bi girî û hawarê destên xwe radike û yek bi yek li ser goran digerîne heya digihe ser gora evîndarê xwe û bêhna yar ji kûr his dike. Hêdîkan û aram radiweste! Û wê gavê hawar û qêrîn pê dikeve:

*Ellah mezar mezar e*
*Wa çi rozigar e*
*Ellah mezar mezar e*
*Xerîb rozigar e*
*Ellah mezar mezar e*
*Aşiq gunehkar e*

Gel û jinên herêmê ku şahidî ji vê evîndariyê re dikin, ji vê rewşê pir bandor dibin û hemû bi yek dengî tev li hawara vê jina ciwan dibin, her yek dibe hevrê û dengê bi êş yê vê jina ciwan û xwe di rondikên wê de aram ber didin. Bi her peyva ku li serê îskeîskên wê diqetîn û dihatin xwarê hevokek pêk hat û jin, ciwan, her kesê ku li wir bû êdî bibû dengê kelegiriyên wê… Êş bibûn keder û xwe li henaseyên wan dixistin. Çavên wê nedidîtin, lê vê gavê di çavên her kesê de evîna wan olan dida!

# Peywira veşarî polîs û leşkeran: Destdirêjî

Qedrî Esen

Li bakurê Kurdistanê zarok û jinên kurd di hedefa leşker û polîsên zayendperest de ne. Ji aliyê dewletê ve polîtîkayek zayendperest hatiye afirandin û di vê çarçoveyê de êrîşên zayendî li zarok û jinan tên kirin. Ev polîtîka, bi salan e di meriyetê de ye û bi hezaran zarok û jinên kurd bûne mexdûrê wê. Li gel bertekên ku tên nîşandan jî, dewlet terka vê polîtîkayê nake.

Armancên vê polîtîkayê gelek in lê armanca esas xistina zaroka û jinan e. Polîs û leşker bi vê polîtîkayê zarok û jinan dixînin û bi rêya MÎT'ê sîxuriyê li wan ferz dikin. Ev polîtîkaya kirêt, ji bo têkbirina daxwaza kurdan a azadiyê tê meşandin. Ji ber vê yekê polîs û leşkerên ku destdirêjî zarok û jinan dikin, ceza li wan nayê birîn û piştî demekê bi payeyên bilind tên xelatkirin.



Li Şirnex, Dêrsim û Elihê; mele, polîs û leşkeran peywireke veşarî pêk anîn û destdirêjî zarok û jinan kirin. Li Êlihê mexdûra destdirêjiya çawişê pispor M.O. xwest dawî li jiyana xwe bîne

**Parastina destdirêjiyê**

Hefteya borî jî careke din mele, polîs û leşkeran serî li vê polîtîkayê dan û destdirêjî zarok û jinan kirin. Li Şirnexê çawişê pispor ê bi navê A.A. li avahiyekê dest dirêjî zarokeke 13 salî kir. Zarokê xwe bi zorê ji dest çawişê pispor A.A. xelas kir û serpehatiya xwe ji malbata xwe re vegot. Piştre A.A. ji aliyê malbat û niştecihên avahiyê ve hat desteserkirin û radestî polîsan hat kirin.

Li gel ku çawişê pispor A.A. li ser sûc hat qefaltin jî, walîtiya Şirnexê destpêkê lê xwedî derket. Walîtiyê, angaşt kir ku çawişê pispor alqolê vexwariye û ji ber vê yekê bi awayekî serxweş êrîşî zarokê kiriye. Jixwe timik dema polîs û leşker li Kurdistanê dest dirêjî zarok û jinan dikin an serxweş in an jî derûniya wan xerabe ye! Lê êdî kes bi van derew û berovajîkirinan naxape.

**Bertekan ew da girtin**

Lewre destdirêjiya çawişê pispor A.A. û daxuyaniya walîtiyê di serî de li Şirnexê di nav kurdan de bû sedema bertekên mezin. Ciwanên şirnexî daketin qadan û bi saetan meş li dar xistin. Ciwanan daxwaz kir ku çawisê pispor bê cezakirin û hesabê destdiriyê jê bê pirsîn. Her wiha li ser medyaya civakî jî gelek bertek hatin nîşandan. Bi milyonan kurd dewlet şermezar kir û xwestin ku ser bûyerê neyê girtin. Li ser van bertekên zêde derbarê çawişê pispor A.A. de lêpirsîn hat destpêkirin û ji peywirê hat dûrxistin û girtin.

**Jinan biçûk xistin**

Bûyereke bi heman rengî jî li Dersimê qewimî û dîmenekî ku polîs û meleyekî diyanetê gotinên zayendî ji jinên kurd re dibêjin derketin holê. Di dîmen de 3 polîs û meleyekî li ser maseyekê dilîzin û gotinên zayendperest ku mirov şerm dike binivîse ji jinên kurd re dibêjin û wan biçûk dixînin. Piştî ku ev dîmen li ser medyaya civakî hatin parvekirin û ji hêla kurdan ve gelek bertek hatin nîşandan, der barê her sê polîs û mele de lêpirsîn hat destpêkirin. Li gorî walîtiya Dêrsimê her çar jî ji peywirê hatin girtin. Lê wê di demeke nêz de careke din vegerin ser peywira xwe û bi payeyên bilind bên xelatkirin.

**Destdirêjiya li Qubînê**

Li gundê Hemdûna yê navçeya Qubînê ya Elihê jî bi destê çawişekî pispor bûyereke hê kirêttir qewimî. Çawişê pispor ê bi navê M.O. zaroka 17 salî ya bi navê Î.P. bi rojan desteser kir û piştî ku tecawizê wê kir ew radestî malbata wê kir. Li gel ku zarok û dayika xwe serî li rêyên qanûnî didin û giliyê çawişê pispor dikin jî kes dengê wan nabihîze. Her wiha çawişê pispor M.O. bi çekê gef li wan dixwe û hêza xwe ya ku ji dewletê digire tîne ziman û dibêje ku wan bikuje jî tu kes hesab jê napirse.

Piştî radestkirina malbata xwe bi çend rojan Î.P. li mala xwe ya li gundê Hemdûna gule berî xwe da û xwest dawî li jiyana xwe bîne. Î.P. dema ku wê radikin nexweşxaneyê ji dayika xwe re dibêje ku ji bilî dawîanîna li jiyana wê tiştek di destê wê de nemaye. Bi destê çawişê pispor ev zaroka kurd bi vê aqûbeta biêş re rû bi rû ma. Her çiqas bi destê çawişekî pispor ev hatibe kirin jî, mêjiyê vê kiryarê mêjiyê dewletê yê li hemberî kurdan e.

**Rêya pêşîgirtinê teşhîrkirin e**

Ji vê jî armanc rûmet û pêşeroja kurdan e. Lewre zarok pêşeroj in. Li gorî zihniyeta xwe ya gemarî dixwazin dest dirêjî pêşeroja kurdan bikin û wan bê rûmet bikin. Rêya pêşîgirtina vê polîtîkayê di teşhîrkirinê de derbas dibe. Kî dibe bila bibe kesên ku destdirêjî zarok û jinên kurd dikin divê bên teşhîrkirin û heta ku hesab ji wan bê pirsîn, di her warî de bên şopandin. Ne aşkerakirina destdirejiyê, destdirêjî bixwe şerm e. Ji ber vê jî divê destdirêjî veşarî nemînin.

# RES ji bo Mêrdînê hem gef hem jî xisar in

Bêrîvan Kayî

Şîrketa Anonîm a Ceyranê ya Dîcleresê, li Mêrdînê projeyeke Santralên Enerjiya Bayê (RES) amade kir. Şîrket ji bo vê projeyê dê li navçeyên Qoser, Şemrex û Dêrikê yên Mêrdînê nêzî 50 turbînên bayê çêbike. Şîrketê, destpêkê ji bo projeyê serî li Wezareta Hawirdor û Bajarvaniyê û Nirxandina Bandora Hawirdorê (ÇED) dabû. Wezaret û ÇED'ê rapora "erênî" dabû projeyê.



Şaxa Yekitiya Odeyên Endezyar û Avahisazên Tirk (TMMOB) a Mêrdînê,Tevgera Ekolojiyê ya Mêrdînê û gelek aktîvîstan, der barê bandora neyînî ya projeyê ya li ser hawirdor û ekolojiyê raporek amade kir û hefteya borî ji raya giştî re ragihan. Endamê Tevgera Ekolojiyê ya Mêrdînê Egît Ozdemîr, der barê projeyê de axivî û bandora neyînî ya projeyê vegot.

**Hejmarên turbînan**

Ekolojîst Egît Ozdemîr, ji 2012'an ve di nav tevgerên ekolojiyê de cih digire û hê jî xebatên xwe yên di nav tevgerê de didomîne. Ozdemîr, aliyên trubînên bayê yên teknîkî û encamên neyînî yên ku ev proje bixwe re bîne nirxandin û diyar kir ku dê projeya RES'ê bermahiyên dîrokî, nebatên endemîk û cureyên ajalên vê herêmê tune bike.

Ozdemîr, da zanîn ku ji bo projeya RES'ê dê li Dêrikê 37, li Şemrexê 9 û li Qoserê jî 4 turbîn werin çikilandin û tenê ji bo vê projeyê 318 milyon butçe hatiye amadekirin û wiha got: "Li gorî lêkolîn û çavderiyên me; dê li ser sînorê 16 taxan turbîn werin çikilandin. Ji 50 turbînî 25'ên wan 0.9 megabayt û 25'ên wan jî 1.5 megabayt hêza wan heye. Tevahî hêza vê projeyê wekî 60 megabaytî tê texmînkirin. Ev yek jî tê wateya ku dê cihên dîrokî ku di nav sînorên herêmê de dimînin, ji hêza bayê van turbînan pir zirarê bibînin."

**Gefa li ser xweza û dîrokê**

Ozdemîr, bal kişand ser berhemên dîrokî yên ku dê di bin bandora turbînên bayê de bimînin û ev tişt anî ziman: "Li gorî encamên lêkolînên me yên li ser vê mijarê; ji Keleha Rebatê û Sûlava GAP'ê dê di nav vê projeyê de bimînin. Helbet em li gorî lêkolînên xwe yên bi derfetên kêm em gihaştin vê encamê û hê gelek deverên ku me xwe negihandê jî hene. Hewce ye ku kesên wekî arkeolog jî werin van berhemên ku dê zirarê bibînin û bînin ziman."

Sulava GAP'ê perçeyek ji tevahiya xwezaya Mêrdînê ye û cihê seyrana niştecihên bajêr e. Keleha Rebatê jî di dema Romayê de hatiye çêkirin û heta roja me jî li ser pêyan e. Keleh, di sala 2010'an de wekî qada sîtê ya arkeolojîk hatibû tescîlkirin. Ozdemîr, derbarê vê yekê de jî got ku wê her du cih jî zirarê bibînin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Xisara herî mezin dê Keleha Rebatê bibîne, ji ber ku zêde nêzîkî turbînên bayê ye. Dema em li mînakên RES'ê yên heta niha hatine çêkirin meyze bikin, em dibînin ku xisara herî mezin daye ajalan û nebatên li derdora santralan."

**Bandora li aboriyê**

Ozdemîr, destnîşan kir ku dê projeya RES'ê bandoreke neyînî li aboriya herêmê jî bike û der barê vê de ev nirxandin kir: "Heger ku ev turbîn werin çêkirin dê cotkar jî nikaribin erdê xwe biçînin û sewalên xwe biçêrînin. Ji ber ku herêm debara xwe bi sewalkarî û cotkariyê dike, dê rewşa aborî her biçe xerabtir bibe. Çêkirina turbînan dê li ser derûniya niştecihên herêmê jî bandor bike. Ya din jî ji bo avakirina van turbînan, dê rê werin çêkirin û deverên ku ne rast bin, ji bo çêkirina rê werin teqendin. Dîsa înşeatê bên çêkirin. Yanê bi kurtasî dê ev proje ekolojiya herêmê tevlihev bike. Dê li ser avhewayê tevî bandor bike."

Egît Ozdemîr di dawiya axaftina xwe de bang li kesên wekî biyolog û arkeolog kir ku bi awayekî pisporî lîsteya cureyên ajalan, berhemên dîrokî û cureyên nebatên ku ji turbînan xisarê bibînin amade bikin.

## SÎNEMA DI TARIYÊ DE DIKARE BIBE ÇIRA

# Sînemaya kurdî xwedî pêşerojek bihêz e

→ Bêrîvan Kayi

Divê sînemaya kurdî ne tenê trajediyê ji xwe re bike mijar. Her mijar ji bo sînema û hunera me potansiyel e. Kêmasiya hunera me ya yekemîn belkî jî ev e. Rast e jiyaneke me ya trajîk heye. Lê jiyan didome. Di nav jiyanê de jî her tişt heye

*Di navbera salên 2008-2012'an de di nav ciwanên kurd ên li zanîngehan de demekê navê gelek kesan "Mahmût" bû. Di filmê "Bahoz" de ji bo ku ciwan ji aliyê polîsan ve deşîfre nebin navê xwe dikirin Mahmût. Em dikarin bêjin ku filmên Kazim Oz, êdî di sînemaya kurdî de xwedî cihekî mutewazî bûn. Ew ji sala 1992'yan ve, di sînemaya kurdî de cihê xwe digire. Bi filmê "Bahoz" re jî her diçe di dilê gelek filmhezên kurd de cihê çêdike. Derketina Cemal a ji Dêrsimê (li ser keştiyê cenazeyek heye) û piştî zanîngehê biryara wî ya 'tevlîbûnê' (li ser eynî keştiyê dawetek heye) aliyê Oz ê vegotina rastiya civaka kurd nîşan dide. Ew di filmên xwe de bi gelemperî rewş û helwesta gelê kurd vedibêje.*



***Di filmên Kazim Oz de bi giştî em rastî amûrên mêtingehiyê tên (sembolên wek leşker, al, wêne, peyker). Gelo sedema vê yekê çi ye?***

Wekî hûn dizanin, di jiyana me kurdan de amûrên bi vî rengî gelek bi bandor in. Ev sembol gelek tiştan tînin bîra mirovan. Ew bandorê li me dike û koletî, azadî, dîrok û çanda me tîne bîra me. Bîra me bi travmayên bi vî rengî û bi amûrên wiha tijî bûye.

***Di filmê te yê dawî (Zer) de tu berê temaşevanan ji New Yorkê didî Afyon û Dersimê. Di belgefîlma 'Hebû, Tunebû' de jî tu berê temaşevan ji Êlihê didî Enqereyê. Jixwe di fîlma 'Fotograf' de jî em dikarin bêjin çîrok di rê de derbas dibe. Di filmên te de rê û rêwîtî pir hene, çima?***

Rast e di filmên min de rê û rêwîtî pir cih digirin. Sebeba yekemîn jiyana min e. Ji ber ku ez her tim di rê de me. Heta ez dikarim bêjim ez her tim rêwî me. Ji ber ku ez ji rê hez dikim, rê bi xwe şoreşger e. Em çiqas tevbigerin evqas baş e. Tabî maneya vê rêwitiyê ne tenê fîzîkî ye. Rêwîtiya di ruhê mirov de, pir lazim e. Rêwitiya di hestên me de jî pir girîng e. Di nav temaya rêwîtiyê de metaforek guhertinê heye. Guherînerî jî nêzîkî hunerê ye.

***Di belgefîlma xwe 'Hebû Tunebû' de tu bixwe jî di nav mijarê de rol digirî. (Em carinan dibînin tu bi Dîlber, Saîm û hema bêje bi tevan re diaxivî) Kazim Oz çima terzek bi vî rengî tercîh dike?***

Erê dema ku ez belgefîlmekê dikişînim bi awayekî ez jî tevlê dibim. Qet nebe siya min tê de ye. Ji ber ku li gorî min çêkirina belgefîlmekê rêwîtiyeke şexsî ye. Çêkirina hunerê bi giştî jî wisa ye. Çêkirina fîlman; parvekirina tiştên min di rê de dîtî, tiştên min hîs kirî, tiştên ez der barê wan de fikirîme. Li gorî min hebûna min a di nav belgefîlmê de tiştekî asayî ye û veşartina afirînêr ne hewce ye.

***Di filmên te de tim û tim berê te li Dêrsimê ye. Carnan çîrok li Dêrsimê dest pê dike, diçe Stenbol, Newyork û hinek deverên din û li Dêrsimê bi dawî dibe. Aliyên erênî û neyînî yên evqas kirpandina cihekî çi ye gelo? Her wiha bi vî awayî sînemaya te herêmî namîne?***

Ya rast ez tev li vê nêrînê nabim, ji ber axa ku mirov lê hatiye dinyayê, cihên ku zarokatî lê derbas bûyî, di jiyana mirov de, di ruhê mirov de cihekî pir mezin digire. Afirandina hunerî gelek girêdayî vê mijarê ye. Hemû jiyana mirov a zarokatiyê ji her alî ve, bandoreke mezin li jiyana mirov dike.

Frued belesebep nabêje, heta şeş saliyê di şexsê mirov de hema hema her tişt rûdinê.

Despêka min a sînemayê bi rastî gelek sal piştî çûyîna min a Dêrsimê tê. Nizanim çima lê li Dêrsimê ez ji dinyayê baştir fêm dikim. Ez wisa hîs dikim ku çavê min ê sînemayê li vir e. Ev rastî ne herêmî ye. Di hunerê de herêmî û giştî ne li dijî hevdû ne. Car caran tu çiqas herêmî lê binêrî ewqas giştî dibe. Car caran jî tu çiqas giştî binêrî tu ewqas qîmeta tiştên herêmî keşf dikî.

***Sînemaya polîtîk tim rastî sansûrê tê. Gelek caran filmên te jî rastî qedexe û astengiyan tên, di pêvajoya kişandina filman de, ev çiqasî bandorê li ser te û berhemên te dike?***

Li dewletên weke Tirkiyeyê huner her tim rastî astengiyan tê. Fîlmên min hemû rastî gelek astengiyan hatin. Dema çêkirinê, dema belavkirinê, dema lêkolînê her tim min astengî dîtin. Lê xwezaya vî karî wisa ye. Ji ber wê yekê ku astengî tune bin wê demê di xebatên min de tiştek şaş heye. Lê bêguman bandorên wê yê neyênî hene; wekî mînak ew astengî dikin ku karê me dereng bimîne. Dema ku em nikaribin xwe bigihînin gel ew yek dibe sedem ku têkiliya min û berhemên min bi bîneran re sist bibe.

***Sînemaya kurdî bi giştî li ser trajediyan ava bûye û ev berdewam e. Gelo ev yek bandorek erênî an neyînî li sînemayê dike?***

Li gorî min ev nêzîkatiyeke ne di cih de ye û şaş e. Divê sînamaya kurdî ne tenê trajediyê ji xwe re bike mijar. Her mijar ji bo sînema û hunera me potansiyel e. Kêmasiya hunera me ya yekemîn belkî jî ev e. Rast e jiyaneke me ya trajîk heye. Lê jiyan didome. Di nav jiyanê de jî her tişt heye. Mesela, gelek çiqas tiştên trajîk bijî jî li beramberî van trajediyan ewqas komediyê jî dijî. Mesela, ez dikarim bêjim, kurd ji almanan komîktir in. Heta ez dikarim bêjim ku kurd ji wan zêdetir dikenin.

***Gelo sînema dikare psîkolojiya mêtingeriyê bê bandor bike û kesên bindest ji wê psikolojiyê xelas bike?***

Di vê mijarê de bandora sînemayê gelekî bi hêz e. Belkî ew nikaribe bi serê xwe an jî rasterast bindestiyê ji holê rabike. Lê bandora wê di şerê xweparastinê de, di hişyarbûnê de, di avakirana hişmendiyeke nû de dikare roleke gelek girîng bilîze. Sînema di tariyê de dikare bibe fener.

***Di senaryoyên te de karekterên jin ên sereke, bi taybetî yên li gund dijîn (wekî Zer, Fotograf, Bahoz) bêhtir di nav bêdengiyê de ne. Heta carinan mirov qet navê wan karekteran jî nabîhize. Sedema vê yekê çi ye?***

Bi rastî jî ez tev li vê yekê dibim, ji ber karekterên jin di nav sînemaya kurdî de gelekî kêm in û ez jî wê yekê wekî kêmasiyeke mezin dibînim.

Belkî ji ber ku ez mêr im loma ketime wê kêmasiyê! Ez vê yekê weke rexne li ser xwe qebûl dikim. Bi hêvî me ku ez ê bikaribim wê kêmasiya xwe derbas bikim û fîlma ku ez niha li ser dixebitim, bi temamî li ser jinekê ye. Ez hêvî dikim piştî vê fîlmê nîqaşeke baş di vê der barê de dê were kirin. Di sînemaya kurdî de karakterên jin bi rastî jî gelekî kêm in. Ev jî kêmasiyek mezin e.

***Tevî hemû êrîşan li rojavayê Kurdistanê em dikarin bêjin ku sînemayeke serbixwe êdî ava bûye. Tu sînemaya Rojava çawa dinirxînî?***

Li gorî ku ez dibînim, li rojavayê Kurdistanê di warê çand û hunerê de kedek pîroz tê dayîn. Di encama vê kedê de, hinek berhemên hêja jî derdikevin holê. Lê bi giştî em nikarin der barê wê kedê û wan xebatên sînemayê de bêjin sînemayek cuda, an jî sînemayek serbixwe derketiye holê. Hin tişt hene û bi xwe re tiştekî dilivînin lê hîna jî di vî warî de bi liv û tevger nebûye.

***Li gorî te sînemaya kurdî bi gelemperî di çi astê de ye?***

Li gorî min sînemaya kurdî xwediyê pêşerojek bihêz e. Di vê derbarê de, mirov dikare bêje ku ew niha li dinyayê hêdî hêdî dibe xwedî cihekî girîng.





### Kazim Oz kî ye?



Derhenêr û senarîst Kazim Oz, di sala 1973'yan de li Dêrsimê ji dayik bûye. Li Zanîngeha Yildiz Teknîkê, beşa endezyariyê xwendiye. Piştî wê lîsansa xwe ya bilind li Zanîngeha Marmarayê li ser sînemayê dike. Di sala 1992'yan de li Teatra Jiyana Nû dest bi derhêneriyê dike. Di damezrandina Sînemaya 13& Mezopotamyayê de cih digire û demeke dirêj tê de dixebite.
Gelek fîlm û belgefîlmên wî yên wekî 'Ax, Fotograf, Dûr, Bahoz, Demsala Dawî û Hebû Tunebû' xelat wergirtine.

# Desthilatdarî nêr e

Çorê Arda



Desthilatdar-î nêr e, nêrbûna xwe di her şêwazê de didarîne. Desthilatdar dikeve her rengî, rûyê desthilatdar tune ye. Ji bo desthilatdarîyê tenê tiştek girîng e, ew jî berdewamkirina hebûna desthilatdarîyê ye. Loma Foucault hewante nabêje: "Desthilatdarî li her derê ye.'' Helbet Foucault di vê gotina xwe de behsa nexweşxaneyan, dibistanan, qehwexaneyan, hemû saziyên ewlehîyê û perwerdehîyê, hefs, mal û hwd. dike û gişan weke desthilatdarîyê û hefsê dibîne. Çimkî hemû sazî, mekan û saziyên girtî cîyên desthilatdarîyê û hefsê ne.

Heke mirov bi kitekit li jiyanê binêre, mirovê fêm dike ku bê çawa kindirê desthilatdarîyê xwe li me badaye û xwe li bedena me rapêçaye mîna maran. Heta jiyana rojane ya em niha li ser malperan bi kar tînin jî desthilatdarîyê li me dike û me diguvêşe mîna kevnikeke şil. Em bi ber bayê desthilatdarîyê ketine haya me ji bayê felekê tune ye. Loma desthilatdar ji bo hebûna xwe bidomîne, dikare her kirasî li xwe bike. Weke bûkalemûnan e. Hewante bavê sîyasetê Machîavellî nabêje; "Hemû rêyên diçin serkeftinê giş mubah in'' Dêmeg desthilatdar ji bo ku bi ser keve, dikare her tiştî bike.

Ji bo çi min evqas behsa desthilatdarîyê kir, çimkî romana Mihemed Mukrî a bi navê 'Segwer' (Reyîn) hutika xwe ya bindestîyê li maseya serdestîyê xistiye û mase hejandiye. Bindestîyê lingên maseya desthilatdarîyê derizandiye lê neşikandiye. Belê mijara romana Mihemed Mukrî desthilatdarî ye. Di bin sîwana desthilatdarîyê de derûnîya karekterekî melankolîk ê serketî hatiye hûnandin. Karekter ji mirinê natirse û mirinê êdî ji rêzê dibîne. Loma hutika xwe li maseya desthilatdar û desthilatdarîyê xistiye. Li dijî mirinê derketiye. Ji karekterê me re mirin êdî bûye serketineke pîroz. Çimkî karekter mirin têk biriye. Îcar karekter kî ye? Kareter nivîskar bixwe dixuyê, çimkî kesê diaxive di romanê de navê wî li holê tune ye. Wê çaxê em dikarin bêjin kesê diaxive vebêj (nivîskar) bixwe ye? Vebêj (nivîskar) behsa desthilatdarîyê, behsa birakujîyê, pêşmergeyan û serdema xwe ya tê de jiyaye ya li Hewlêrê û li Başûr pêk hatiye dike. Vebêj di hefsê de ye, di hundirê hefsa serê xwe de diçe bîranînên xwe û di van bîranên xwe de piranî bi dêya xwe re dikeve dîyalogên cihêreng. Mînakek ji romanê: "Te hefsarê bîranînên xwe berdaye û bi serkêşî di deryaya bîranînên xwe de avjeniyê dikî!''(r. 21) Em dibînin vebêj xwe ji werîsê derbinhişîyê filitandiye û bi serserkî berjêr diçe. Heta roman diqede jî bi dêya xwe re diaxive, bi şêwazeke monologî, xeyalî, groteskwarî û dijaqilî. Rasyonelbûna karekter ji destê wî şemitîye û heta ku carinan bi xwe dihese. Bavê karekter bi îşkenceyê hatiye kuştin. Xwişka wî ne aşkere be jî, mîna ku ji terefê desthilatdaran ve hatibe tecawizkirin tê vegotin. Mînak ji romanê: "Kurê min, namûs ji her tiştî girîngtir e. Ez nabêjim ku ez kêfxweş bûm, çima Nesrînê xwe şewitand. Lê bi min ne xweştir dibû ez wê di vî halî de bibînim.''(r. 27) Em dibînin ku paşê xwişka wî xwe dişewitîne û mîna bi dilê dêya wê be. Halbûkî a sûcdar di vir de ne Nesrînê ye. Yê sûcdar desthilatdarê nêr e. Dema dibêjim nêr bila tenê zayendî nekeve hişê we, hemû tiştên hişk nêr in. Helbet têgiha namûsê bi serê xwe mijareke din e û di nav gelên bindest de jî bêtir bi bandor e. Talî ji malbata wan tenê dêya wî dimîne. Dema bi dêya xwe re dikeve dîyalogan helbet li hevalên xwe Dilşad, Şêrzan û Azad jî dipirse û hwd. lê piranîya hevalên wî yan hatine daliqandin an jî hatine şewitandin…





Karekterê me di hundirê odeya serê xwe de, li neynika rastîya xwe, rastîya rewşa gelê xwe, li rastîya hevalên xwe dinêre û di derûniya xwe ya hundirîn a hebûnê de digewime; heta ku kuntêla ava hebûna wî vala dibe û vediguhêze hîçekî. Derûnîya tenêbûna xwe ya di hefsê de, mîna findekê diçirisîne dijî di odeya xwe de û em jî lê hay dibin ku çirûsk ji odeyeke tarî diçirisin. Desthilatdar biryara daliqandina vebêj-karekter dide lê ne xema vebêj-karekter e, ji mirinê natirse, çimkî xema wî ji mirinê wêdetir e. Mînak: "Doh, ber êvarê bû dema ji te re gotin ku dê sibê bi şev fermana daliqandina te bi cih bînin. Li gorî te tiştekî normal bû û karekî wiha li te nekir. Te bi girnijîn nûçe wergirt. Te tiştek negot. Wan ji te ra got me nûçe ji diya te re jî şandiye, da hûn ji bo cara dawî hevdû bibînin.''(r.21)

Vebêj-karekter wekî me got daliqandinê nake xem û tiştekî normal dibîne. Helbet sedemên wê hene, piştî ewqas serpêhatî, zilm û zordarîyê êdî bo vebêj daliqandin mîzgînîya xêrê ye; weke xelatekê ji xwe re hildibijêre. Di hundirê hefsa serê xwe de xwebixwe dikeve dîyalogên derûnîyeke hundirîn a xwebûnîyeke melankolîk û hebûn û serîrakirina xwe ji me re vedibêje. Lê tim hewl dide ku li ser dîwarê hefsê bi xelekên zincîrên di destên xwe de peyva ''Reyîn û Rewînê'' binivîse. Çima? Helbet di vir de seg metafor e. Di hin çîrokan de metafora neyînî ye û di hin çîrokan de jî metafora erênî ye. Mînak: Di çîroka Sehê Zozana ya Qedrî Canî de seg "Dilsoz û Mêrxas e, heyfhiland e.'' Di çîroka Kûçikê Tûlê ya Sadiq Hîdayetî de seg "Dêlik e û melankolîk e.'' Di çîroka Şepal a Hesenê Metê de jî seg "Îxanetkar e.'' Lê di Segwer de seg xumamî dixuyê. Mirov tam tênagihîjê, dilsoz e, xayîn e an jî melankolîk e. Lê karekterê me melankolîkekî serhildêr e loma îhtîmal e ku Segwer jî segekî romantîk ê serhildêr be.

Talî ruhekî romantîk ê serhildêrî xwe li bedena karekter rapêçaye; mîna qijnîkekê bi ruhê wî ve zeliqîye û jê naqere. Mijar û karekterê romanê bi şêwaza têrtîrbûneke derûnî hatiye hûnandin. Mînak ji romanê: "Agir ketibû herdu terman. Herdu term bûbûn komir. Du seriyên reş û şewitî. Çend hestiyên dest û piyan ku qet ji hev nedihatin naskirin kîjan ên Dilşad û kîjan ên diya wî ne.'' (r. 48) Dema em li vê peregrefê dinêrin, desthilatdarîya nêr bi aşkera xwe diradestîne. Mirov encax derûniyeke wiha têrtîr û çîrokeke wiha hiş û dilê mirov bibirêje û agir bi mirov bixîne bihûne. Gelo kîjan çîrok dikare vê rastiyê û desthilatdarîyê vebêje? Bifikirinhevdilîniyê bikin ku mirov laşên şewitî li ber çavên xwe bibîne. Trajedî û êşê, di hembêza desthilatdarîyê de serî rakiriye. Dergûşa desthilatdarîyê ji cî ve leqandine. Çimkî desthilatdar harr û dîn bûye loma ewqas laşan dişewitîne û dike qîjot. Helbet ditirsin, ji ber tirsa xwe ye ewqas bi xedarî û bêronî êrîşê dibin ser bindestan an jî dîtiran…

Weke encam: Roman, mijara xwe ji rasteqînî û dîrokê wergirtiye. Ji pirtûka dîrokê tenê rûpelek e, rûpelên wiha di dîroka kurdan de nayên jimartin çimkî pirr in…



Sîdar Jîr



## "KORERÊ"
## Rêyeke Dûr û Dirêj e

Berhemên edebî, parzûnkirina êşên takakesî û civakî ne; ne di dil û hestan de hiltên, ne mirov kare wan veşêrin. Axir piştî demekê, nivîskar a di dil de dide der. Dilê nivîskar (ê hinî gelek tiştan bûye) jî êdî nema kare wan tiştan di dilê xwe de û tenê ji bo xwe bihewîne. Yanê gava roja zayînê tê, nivîskar/edebiyatkar, êşên ku bi hestên kûr û pak demeke dirêj di dilê xwe de mezin kirine, bi rêyeke şahîk û estetîk dide der. Ev yek ne wekî êş û jana fizîkî ya zayînê dijwar be jî, ji aliyê amadekarî û hayjêhebûnê ve piçkî dişibe zayînê… Yanê gava zarokek hîn di malzaroka dêya xwe de be jî her kes dizane – bi awayekî asayî- ew ê rokê were dinyayê. Êş û janê dayik dikêşe lê her kes bi zarok şa dibe. Berhemeke edebî jî wisa ye. Di xwendina her çîroka KORERÊ ya Brahîm Ronîzêr de, xwîner vê yekê pir eşkere dibîne. Brahîm Ronîzer, hest û êşên em giş pê dizanin, di dilê xwe de mezin kirine, gava êdî di dil de hilnehatine, ew parzûn kirine û bi henûnîyeke gelekî zîrek pêşkêşî xwîneran kirine.

KORERÊ, bi awayekî teknîkî, ji du beşan û nozdeh kurteçîrokan pêk tê: Korerê(7) û Wêneçîrok(12).

Brahîm Ronîzer, di hemû kurteçîrokên KORERÊ'yê de olana tevziyên civakeke bêdeng neqlî kerrika guhê xwîneran dike. Nivîskar, bêyî xwîneran aciz bike, bi zimanekî henûn û comerd gerdûna çîrokên xwe bexşî xwîneran dike. Di gelek çîrokan de, bi kod û şîfreyan bala xwîneran disû û dibe ser "ewa ditir." Helbet gava vê yekê dike nahêle xwîner bi zehmetiyan biêşe... Di çîroka pêşîn "Rêka Dibistanê" de wiha dibêje: "Heke xelk pê bihise ku mevanên wan ên xwedî tifing tên û diçin, ku hinekên din pê bihisin wê cin û pîrebok jî pê bihisin û heke ew pê bihisin dê mala wan bişewitînin." Bi xwendina vê hevokê re, wekî "lehengê" çîrokê Elikoyê di dawîya çîrokê de cin û pîrebok diniqutin dilê wî, heman tişt diniqutin dilê xwînerên baldar jî.

Hemû dîmen û qewimînên di çîrokan de, berê me didin korerêyekê. Nivîskar, derîyê wan kêlîkên jiyana nûjen ên berê wan li korerêyan e û kes nikare jê bireve, li ber xwîner vedike. Ronîzêr di korerêyan de çiqas dabe ser şopa "modernîstên dawîn" jî, di wêneçîrokan de xwîner bi pey felsefeya realîzmeke efsûnî ketiye – te dî ewa însan jî "neynikan ditirse." Heke ji vî aliyî ve mirov li ser hûr bibe, mirov dê bibîne ev gaveke gelekî xurt e û ji xwebûnê tê digihîne gerdûnê. Çawa Borges, Poe, Maupassant, Çexov, Mansfield, Joyce û Kafka li pey hev teqil dan çîrokê, Brahîm Ronîzêr jî, bêyî qerepereya zêde di KORERÊ'yê de bi pistepist teqlek daye çîroka Kurdî ya "nûjen."

Her çîrokek, di korerêyekê de dibe findek. Di ronahiya findê de, sîyeke melankolîk ber bi nihîlîzmê ve dişûrike, vediguhêze û dibe xwedîyê rengekî fantastîk…

Tenêtî, hevaltî, evîn, dostanî, mirin û mezinbûn bi hev re di dawiya korerêyan de dibin wêneyekî gelekî xweşik û dikeve dilqê temsîlîyeteke gelekî xurt a nifşê "zû mezin bûye" – ji vir şûn de êdî tu kes nikare xwe jê bi dûr bixe.

Brahîm Ronîzêr, di hemû çîrokan de atmosfereke ecêb çêdike, xwîner "destê xwe dike bin çengê xwe" û car caran dibişire, car caran jî xemgîn dibe…

** KORERÊ, Brahîm Ronîzêr, Kurteçîrok, Weşanên Lîs, 2014*

# Fermana sêyemîn ‘fermana spî’!



Mem Avba



Salvegera 6’emîn a fermana 73’yemîn nêz dibe. Lê lîstik û plangeriyên metirsîdar, li ser Şengal û êzidiyan didomin. Şeş sal berê bi destê DAIŞ'ê ku li ser zibilgeha zilhêzan derketî, fermaneke hovane pêk hat. Di sedsala 21’emîn de mirov bi saxî xistin gorên komî, hatin şewitandin û li bazaran hatin firotin!

Niha jî li hemberî Şengal û êzidiyan plangeriyeke metisîdar tê honandin. Heta niha 73 ferman li ser civaka êzidî hatine pêkanîn. Lê di dîroka nêz de sê ferman hene ku hêjayê nirxandinê ne…

Salên 1960-70’yî li tevahiya cîhanê pêla şoreşgerî û tevgerên rizgariya neteweyî pêş ketî, bandor li Kurdistanê jî kiribû. Li Başûrê Kurdistanê bi pêşengiya Merhûm Mele Mistefa Barzanî li hemberî rejîma Baasê (Iraqê) têkoşîn hatibû destpêkirin. Yek ji cihên herî zêde ev têkoşîn lê pêş ket Şengal bû. Civaka êzidî li hemberî faşîzm û qirkeriya rejîma Baasê ligel pêşmergeyên Kurdistanê cih girtibû.

Piştî ku di sala 1975’an de bi peymana Cezayîrê ya di navbera Îran û Iraqê de pêk hat, her du dewletan bi hev re tevgera kurd anîn ber têkbirinê. Lewre beşeke girîng a tevgara kurd penaber bû û beşek (şêx, axa, mela, mîr, serokeşîr) jî hevkarî û nokeriyê qebûl kir!

Piştî ku tevgera kurd belav dibe, civaka êzidî jî bê palpişt dimîne û bi hovîtiya rejîma Baasê re rûbirû dimîne. Piştî salên 73’yan rejîma Baasê bi hemû xezeba xwe ve tê ser Şengalê. Gundên êzidiyan ên li çiyayê Şengalê hatî avakirin, tên xirabkirin û şewitandin; heta kanî û bîrên avê jî bi betonê tên xitimandin ku careke din neyên bikaranîn!

Komalgehên niha yên li deştê ne wê demê tên çêkirin. Rejîma Baasê, siyaseta ku li herêmên Qeredax, Silêmaniyê, herêma Barzan hwd. meşandî, li Şengalê jî dimeşîne; gundên ku giyana kurdîtî û welatparêziyê xurt e ji bo careke dîtir zindî nebe, xelkê wan li ser komalgehan li deştê belav dike.

Bi vê pêvajoyê re dest bi ‘fermaneke spî’ (ferman, komkujî, tertele, enfal hwd. li her çar beşên welêt ev hatine pêkanîn) dike. Hewl dide civakê ji çand, jiyan, adet, kevneşopî û nirxên wê dûr bixe!

Sala 2014’an, tişta nekarî bi rêbazên ‘nerm-spî’ bike, vê carê bi DAIŞ'ê ku bi pêşengiya nijadqirên tirk, baasiyên kevin, tevgerên îslama selefîradîkal û îstîxbaratên dewletên cîran (dewleta Qeterê jî tê de) pêk tê, kir. Jixwe encama vê pêvajoya trajîk tê zanîn. Hê jî birînên wê nehatine kewandin!

Bi destwerdana Tevgera Azadiya Kurdî re civaka êzidî ji qirkirinê hat rizgarkirin. Piştî wê bi pêşengî û asankariya tevgera kurdî, civaka êzidî û hemû pêkhateyên Şengalê, ji bo ku careke dîtir ferman neyên serê wan, di aliyê siyasî, îdarî, leşkerî, ewlehî hwd. de xwe birêxistin kirin. Meclisa Xweseriya Demokratîk a Şengalê (MXDŞ) hat ragihandin û hemû saziyên pêwîst di bin banê wê de hatin avakirin.

Ligel ku dewleta Iraqê tu berpirsiyariyên xwe yên li hemberî şengaliyan pêk neanîn, nebû alîkar ku civaka êzidî birînên xwe yên fermanê bipêçe jî. Niha ketiye nav dek û dolaban ku vê pergala li Şengalê çêbûyî belav bike. Lê belê vê ne bi rêbazên hişk; bi rêbazên ‘nerm-spî’ dike!

Mînak demek e li ser Şengalê êrîşên hewayî yên dewleta tirk pêk tên. Her kes dizane ku heke bi destûr û erêkirina dewleta Iraqê nîn be Tirkiye nikare wiha bêprewa êrîş bike...

Bi riya munazemeyan (qaşo saziyên xêrxwaziyê!) ku li Şengalê vekirine, ji bo serê civakê tevlîhev bikin, nexasim jî ji bo endam û xebatkarên ku di saziyên Xweseriya Demokratîk de dixebitin teklîfa pere û meaşên zêde dikin.

Dîsa ligel ku nexweşiya koronayê, qedexeya çûn û hatinê heye; şargirt û xwendekarên êzidî yên perwerde kirine, niha bi cil û bergên xemilandî bi formayên ‘kêşer’ bi hêsanî derbasî Şengalê dikin, dibin li komalgehan digerînin, dîmenên wan parve dikin…

Kesên birine li ba xwe perwerdeya leşkerî dane wan, her roj li ser tevnên civakî û çapemeniya xwe wêne û dîmenên wan parve dikin, payeyên bilind ên leşkerî didin wan. Dîsa li gorî zanyariyên malbatên vedigerin Şengalê, ji malbatan re şertê ku zarokên wan di nav artêşa Iraqê de cih bigirin destûr didin vegera wan!

Bi vî awayî dîsa weke ‘Alayên Hemîdî’ weke ‘Qiyadeyî Muweqete’ (cehş) Mustefa Kazimî dixwaze hêzên noker çêbike û bi destê wan, hêzên rêxistinkirî, ya li Şengalê heyî bi rêbazên ‘nerm-spî’ belav bike û civakê dîsa weke berê bê parastin, bê rêxistinî bihêle ku deriyê fermanên nû vekirî bimîne!

Lê belê heke niyeteke baş a dewleta Iraqê ji bo êzidiyan hebe, gava yekemîn divê di parlamentoya Iraqê de komkujiya êzidiyan nas bike û mafên wan ên civakî, komalî, olî hwd. bixe bin ewlehiya destûra bingehîn.

# Sedema êrîşan bêhelwestî ye

Li başûrê Kurdistanê rojeva yekem êrîşên li hemberî herêmê ye. Her beşên civakê bertekên xwe li hemberî polîtîkayên ku li herêmê tê meşandin, nîşan didin. Li aliyekî kampanyaya îmzeyan a ciwanên başûrî, li aliyekî din piştgiriya parlamenteran a ji bo kampanyayê û bertekên welatiyan, niha rojeva esasî ya herêmê ye.

Kampanyaya îmzeyan a ji hêla Jinên Ciwan ên Têkoşer û Ciwanên Welatparêz di 30’yê hezîrenê de hatibû destpêkirin, didome. Kampanyaya îmzeyan a li dijî êrîşên li hemberî başûrê Kurdistanê û derxistina baregehên arteşa tirk hatî destpêkirin, ji 15 hezaran derbas kir. Ciwanên başûrî, demeke dirêj e kolan bi kolan, mal bi mal digerin û îmzeyan kom dikin. Her wiha kampanya ne tenê li Başûr li Iraqê jî tê meşandin.

Bertek û çalakiyên li Başûr tên kirin, dê bandoreke çawa li polîtîkaya herêmê bike, dê di rojên pêş de diyar bibe. Lê tişta herî girîng jî ji her beşên civakê nerazîbûnek heye.

**Piştgiriya parlamenteran**

Parlamenterên jin ên parlamentoya Herêma Kurdistan û Iraqê piştgirî da kampanyaya îmzeyan. Parlamentera parlamentoya Herêma Kurdistan Gulistan Seîd û parlamentera parlamentoya Iraqê Rêzan Şêx Dilêr jî piştgirî da kampanyaya îmzeyan.

Her wiha jinên li herêma Germiyanê dijîn jî, bertek nîşanî êrîşên li herêmê tên kirin da. Berpirsa Komîteya Herêma Germiyanê ya Yekîtiya Jinên Kurdistanê Şukriye Xefur, da zanîn ku hizbên desthilatdar ên Herêma Kurdistanê lembeya kesk ji bo Tirkiyeyê pêxistine û got: “Ji bo vê dewleta tirk êrîşî herêmê dike. Armanc ne tenê Partiya Karkerên Kurdistanê ye. Armanc dagirkirina hemû xaka Kurdistanê ye. Ev bi salan e ji bo vê plan tê çêkirin, pêwîst e hikûmetên Herêma Kurdistan û Iraqê êrîşan bidin rawestandin. Divê Neteweyên Yekbûyî û Konseya Ewlekariyê jî ji vê were agahdarkirin.”

**Bêdengî rexne kir**

Endama Tîma Germiyanê ya Rêxistina Wadî ya Almanî Xelat Salih, di axaftina xwe de bêdengiya rêveberên kurd rexne kir û wiha axivî: “Bêdengiya li hemberî êrîşan, cihê xemginiyê ye. hikûmeta herêmê jî bêdeng e. Ger helwestek hebe wê êrîş bên rawestandin.”

**Ji hêza kurdan ditirsin**

Rojnamegera jin Rênas Salih jî bal kişand ser êrîşên li hemberî destkeftiyên kurdan û wiha nêrîna xwe anî ziman: “Tirkiye ji hebûna kurdan ditirse, bi taybetî li rojavayê Kurdistanê heya radeyeke mezin hêza kurdan bi pêş dikeve. Tirkiye ditirse ku Başûr jî weke Rojava bihêz bibe. Ev yek wê bibe sedem ku kurd li Rojhilata Navîn bihêz bibin." *HEWLÊR*

# Li Bakur xetereya vîrûsê

Navenda Nûçeyan

Belavbûna vîrûsa koronayê (Covid-19) hê jî li tevahiya cîhanê didome. Li gorî daneyan, li tevahiya cîhanê zêdetirî 13 milyon kes bi nexweşiyê ketine û nêzî 600 hezar kes jî ji ber vîrûsê jiyana xwe ji dest dane.

Her wiha li Tirkiyeyê jî heman rewş heye û piştî ku pêvajoya asayîbûnê dest pê kir, baldariya ji bo xweparastina li dijî vîrûsê jî ji holê rabû. Navenda Sendîkaya Kedkarên Xizmeta Civakî û Tenduristiyê (SES), piştî destpêkirina pêvajoya asayîbûnê li 243 nexweşxaneyên 51 bajaran lêkolîneke berfireh kir. Navenda SES'ê encama lêkolînê ji raya giştî re aşkera kir.

Li gorî lêkolîna hatî kirin, li nexweşxaneyan rêjeya şewba vîrûsê ji sedî 51 zêde bûye, li nexweşxaneyan tenê ji 4'an 1 şewb kêm bûye, ji 4'an 3 jî şewb zêde bûye. Di lêkolîna hatî kirin de wiha tê gotin: “Li nexweşxaneyan ji sedî 24 ji bo serwîsa Covid-19’ê hatiye amadekirin. Li nexweşxaneyên pandemiyê ji sedî 28 beş cuda kirine. Ji sedî 40'ê personelên nexweşxaneyê ji vê yekê ne agahdar in. Ev nîşan dide ku xebatkarên nexweşxaneyê tev li vê pêvajoyê nekirine. Piştî 1'ê hezîranê dîsa dest bi pergala xebata berê kirine. Li nexweşxaneyan ji sedî 77 xebata dorveger rakirine.”



**Şîdet li xebatkaran tê kirin**

Di lêkolînê de hat destnîşankirin ku ji sedî 13'ê nexweşxaneyan beriya emeliyatan, testê ji nexweşan naxwazin û tenê ji sedî 20'ê nexweşxaneyan ji hemû nexweşan testê dixwazin. Di lêkolînê de ev dane hatin parvekirin: “Ji sedî 42'yê nexweşxaneyan jî tenê ji kesên biguman test tê xwestin. Ji sedî 27'ê nexweşxaneyan, heta nîşaneyên nexweşiyê xuya nebin, personelan didin xebitandin. Ji sedî 38'ê nexweşxaneyan, tenê kesên semptomê nîşan didin, testa wan dikin. Ji sedî 15, kesên temas kiribe jî testa wan nayê kirin.” Di daneyên SES’ê de şîdeta li hemberî xebatkarên tenduristiyê jî hat vegotin. Li gorî daneyan di pêvajoya şewbê û pêvajoya asayîbûnê de şîdeta li hemberî xebatkarên tenduristiyê ji sedî 30 zêde bûye.

**Li Bakur hejmar zêde ye**

Hevserokê Şaxa SES’ê a Amedê Şiyar Guldîken jî anî ziman ku 10 qatên nexweşxaneya Gazî Yaşargîlê ji bo pandemiyê tê bikaranîn, li nexweşxaneya Selahattîn Eyyûbiyê 70-80, li ya Gazî Yaşargîlê 190-200 û li Fakulteyê jî 80 nexweş hene û rojê 100-200 kes tên tabûrcîkirin û li şûna wan nexweşên nû tên razandin. Guldîken, da zanîn ku li bajêr rojê nêzî 120 mirov bi şewbê dikevin. Guldîken, anî ziman ku ev 10 roj in hema bêje rojê 2-3 kes jiyana xwe ji dest didin û got ku li gorî hejmarên fermî li bajêr, ji roja destpêkê heya niha zêdetirî 80 kesan jiyana xwe ji dest daye lê belê li gorî hejmarên bi dest dikevin ev zêdetir e.

**220 xebatkar bi vîrûsê ketin**

Her wiha Guldîken diyar kir ku rojê 2-3 xebatkarên tenduristiyê bi şewbê dikevin û wiha domand: "Li bajêr 220 xebatkarên tenduristiyê bi şewbê ketine. Ji 1'ê hezîranê vir ve şert û mercên xebatê pir dijwar bûne. Beriya 1'ê hezîranê xebateke dorveger hebû. Di vê serdemê de xebatkarên tenduristiyê rojekê diçûn kar, 4 rojan nediçûn. Hevalên li beşa testên Covid-19'ê dişixulîn jî 15 rojan dişuxilîn, 15 rojan nedişixulîn. Bi vî awayî dikaribûn xwe biparêzin. Lê piştî 1'ê hezîranê rewş guherî. Hevalên li beşa testên Covid-19'ê dişixulin 15 rojan dixebitin, 15 rojên din jî li serwîseke din dixebitin. Bi rastî jî ev dûrî aqilan e. Wexta hevalên li wir bi şewbê bikevin, dibe ku semptom nîşan nedin lê diçin li beşeke din dişixulin."

# Xwe ji bo êrîşên nû amade dikin

Xweşkanî
Felemez Ulug



Şoreşa Rojava, heşt sal li pey xwe hişt. Ligel zor û zehmetiyên mezin li Rojava yekitiya gelan, bi berxwedaneke bêhempa derket holê. Lê pêwîst e mirov bêje ku lîstik û komployên hêzên navneteweyî yên li ser Rojava hîn jî bi dawî nebûne. Divê mirov balê bikişîne ser xetereyên di pîrozbahiyên salvegera şoreşa Rojava de dê bên kirin.

Geşedenên niha yên li Rojava û Bakurê Sûriyeyê diqewimin, ji her demê zêdetir ji bo gelên herêmê metirsîdar in. Li herêmê her çiqas bêdengî û aramî hebe jî, plan û projeyên hêzên dagirker bi dawî nebûne. Hêzên dagirker ên Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî dagir kirin, niha jî ji bo Kobanê, Dêrik û Qamişloyê çavên xwe sor kirine.

Bêguman li Rojava xebatên yekitiya neteweyî pir hêja û pîroz in lê bi vê xebatê ve girêdayî pêwîst e, mijara herî sereke û girîng mijara parastina axê be. Ji ber ku di van rojên dawî de tê dîtin ku çeteyên di pêşengiya Tirkiyeyê de kom dibin, ji bo êrîşên nû xwe amade dikin. Ev jî êrîşeke pêkan a li dijî Rojava bi xwe re derdixe holê. Bi vê ve girêdayî, dema mirov li hevsengiyên siyaseta Tirkiyê jî mêze dike, di vê mijarê de amadekariyên di warê siyasî û psîkolojîk de bi awayekî aşkera li ber çavan e. Lewma ger di vê demê de di pêşengiya Tirkiyeyê de êrîşek li ser axa Rojava û Bakurê Sûriyê bê kirin, wê ji êrîşên din ên cudatir û biêştir be.

Pêwîst e em vê jî bibînin ku êrîşên li dijî Rojava, bi êrîşên dagirkeriya başûrê Kurdistanê yên li ser herêma Heftanînê tên kirin ve girêdayî ne. Ji ber ku Tirkiye di êrîşên Haftanînê de, li gorî dema tê xwestin serkeftinek bi dest nexe, nikare di eniyeke din de şerê kurdan bike. Ji ber ku ev şer di gelek mijaran de wê ji şerên din cûdatir be. Dewleta tirk a dagirker di vê mijarê de dixwaze xeletiyan neke. Û ya herî girîng jî di vê mijarê de dixwaze hêza navneteweyî bide aliyê xwe. Ji bo vê pir biplan û bînfirehî tevdigere.

Siyaseta Tirkiyeyê ya derve jî li ser dijîtiya kurdan hatiye avakirin. Ji Lîbyayê heta Ewropayê, dewleta tirk ji bo kurd bêbandor û bêmaf bimînin dixebite. Hem di warê leşkerî de hem jî di warê siyasî de dixwaze kurd bê statu bimînin. Ji bo bigihê armanca xwe jî gelek tawîzên mezin da û hêzên navneteweyî dan aliyê xwe. Lewma di mijara êrîşên li dijî Rojava û Bakurê Sûriyeyê de, ev hêzên navneteweyî wiha bêdeng in.

Li beramberî zilm, zordestî, qirkirin, kuştin, qetlîam û bêheqiya dewleta tirk a li ser gelê kurd pêk tîne jî, ev hêzên navneteweyî sektoreke nû ava kiriye. Ev sektor “em bi guman in”, “em xemgîn in” û “em bi şik in” ya ji hêla Neteweyê Yekbûyî, Yekitiya Ewropayê, NATO, Amerîka, Rûsya û Teşkîlata Hevkariya Îslamî pêk tê, tu carî wê berjewendiyên gelan li ser berjewenyên xwe negirin. Bêdengiya wan a li hemberî êrîş û qetlîamên dewleta tirk ên li herêmê dike vê yekê piştrast dike.

Ev hêzên navneteweyî baş dizanin ku dewleta tirk bi hevkariya El Qaîde, El Nusra, Heyet Tahrîrî Şam û DAIŞ’ê ve êrîşî axa Rojava û Bakurê Sûriyeyê kir. Niha jî dewleta tirk bi alîkariya van hêzên navneteweyî dixwaze hevkarên xwe yên şer di qada dîplomasiyê de derxe paqijiyê. Ev çeteyên ji terorîstan jî xirabtir û pîstir, di bin sîwana dewleta tirk de li hemû cîhanê digerin. Lê di vê rewşa wiha kambax de, daxuyaniya Almanya ya ku “em hebûna Tirkiyeyê ya li Rojava meşrû nabînin” kêm be jî pêwîst e mirov di qada naveteweyî de vê binirxîne.

Ji bo hêzên navneteweyî mijara Rojava ne mijareke mirovî ye. Hemû hêz, ji bo li herêmê hin berjewendiyan bi dest bixin, di nav pêşbirkê de ne. Çawa dewleta tirk armanc dike ku kurd bê statû bin, Rûsya û Îran jî dixwazin ku kurd ji derveyî petrola herêmê bin. Ji bo ku ev hêz li herêmê bigihîjin armanca xwe, heta dawî derî li dewleta tirk vedikin.

Di van demên dawiyê de, ji bo êrîşên nû plan tên amadekirin. Pêwîst e mirov nêzîkatî û helwestên hêzên navneteweyî ji nêz ve binirxîne. Bi taybetî jî van rojên ku pîrozbahiyên salvegera şoreşa Rojava tên kirin. Tişta herî girîng jî divê kurd xwe ji bo her tiştî amade bikin.

Çi dibe bila bibe, çiqas lîstik û komplo hebin bila bibin, ya girîng ew e ku gelê kurd ligel hemû zehmetiyan vîna parastina axa xwe ava kiriye. Ev mîrateya şoreşa Rojava ye. Pêwîst e kurd li vê xwedî derkevin.



## Li Rûsyayê xwepêşandana muxalîf

Li dijî guherîna zagona ku maf dide serokdewletê Rûsyayê ji bo heta 2036’an li desthilatê bimîne, xwepêşandan hat kirin. Di xwepêşandanan de guherîna destûrê ya beriya bi demeke kurt hatî qebûlkirin hat şermezarkirin. Li gorî rêxistina civaka sivîl OVD-Înfoyê 142 kes bi hinceta ‘xwepêşandana bêdestûr’ hatin binçavkirin. Li gorî guherîna nû ya destûrê rê hat vekirin ku Vladîmîr Pûtîn heta 2036’an li desthilatê bimîne. Endamê meclisa şaredariya muxalif Yulîa Gallîamîna li ser hesabê xwe yê Facebookê ragihand ku li Moskowê ew ligel keça xwe rehatiye binçavkirin. Galîamîna û alîgiran ragihand, li dijî guherîna destûrê ji bo ku serî li dadgeha bilind bidin 5 hezar îmze kom kirine. Guherîna destûrê dawiya hezîran û serê tîrmehê dabûn ber referandûmê û ji 100’î 78’ê hilbijêran dengê xwe dayê lê hate gotin ku muxalefet dibêje hîle hatine kirin. ***MOSKOW***

## Şerê li Ermenistan û Azerbaycanê

Şerê li ser sînorê di navbera Ermenistan û Azerbaycanê de, piştî agirbesta rojekê, roja pêncşemê ji nû ve dest pê kir. Li gorî daxuyaniyên wezaretên parastinê yên her du welatan, şerê li sînorê bakur hefteya borî sibeha pêncşemê ji nû ve dest pê kir.

Baku û Erîvan hevdu sûcdar dikin û dibêjin ku ew bersivê didin êrîşan. Li gorî daxuyaniya 15'ê tîrmehê ya Wezareta Parastinê ya Ermenistanê, hêzên Azerbaycanê 12'ê tîrmehê li ser sînor ketin nav hewldanên provokatîf û bûn sedema şerê leşkerî. Li ser sînor di şer de yek jê general 11 leşkerên Azerbaycanê mirin. Li aliyê Ermenistanê jî tê gotin ku du leşker mirine. Ermenistan û Azerbaycan ji destpêka salên 1990'î û vir ve ji bo kontrolkirina herêma Karabagê şer dikin. Vê herêmê sala 1991'ê bi piştgiriya Ermenistanê bi rengekî yekalî serxwebûna xwe ragihand. Di şerê li dijî Azerbaycanê de derdora 30 hezar mirovan jiyana xwe ji dest dan. Ev şer sala 1994'an bi agirbestekê bi dawî bû. ***ERÎVAN***

# ‘Pêvajoya Sûriyeyê li Lîbyayê dubare dibe’

Polîtîkayên dîzaynkirina Rojhilata Navîn a hêzên navneteweyî bi her awayî didomin. Her dewletek ji bo Rojhlata Navîn polîtîkayek bi rê ve dibe. Cihên herî krîtik jî her çar parçeyên Kurdistanê ne. Hem li Başûr hem jî li rojavayê Kurdistanê, polîtîkayên taybet tên meşandin. Li her du parçeyên Kurdistanê jî polîtîkayên şer û êrîşan pêk tên.

Niha mijara herî li pêş rewşa Idlib û Lîbyayê ye. Gelek nîqaş û civîn hatin kirin lê dîsa jî, di hêla pratîzekirina biryaran de nakokî hê jî didomin. Her alî li gorî berjewendiyên xwe tevdigere û ji ber vê jî pirsgirêkên heyî li holê dimînin.

Pispora Rojhilata Navîn Hamîde Yîgît der barê mijarên wekî sewqiyatên dewleta tirk ên ber bi Idlibê ve û krîza Lîbyayê de nêrînên xwe anîn ziman. Yîgît, di serî de bal kişand ser ragihandina agirbesta ku di 5’ê gulanê de li Moskowê pêk hat. Yîgît destnîşan kir ku dewleta tirk şertên agirbestê pêk neanîn û ew niha nikare komên çeteyan ji vir derxe û wan kontrol bike û got: “Komên cîhadîst ji ber îmzekirina agirbestê ji aliyê dewleta tirk ve, ne razî bûn û biryar dan ku nehêlin dewriye pêk bên û li dijî dewriyeya Rûsyayê êrîş pêk anîn. Van koman piştre berê xwe da dewriyeyên artêşa dewleta tirk. Bi vê yekê Tirkiye ket nav pêvajoyeke bikrîz. Li aliyekî nikare cîhadîstan kontrol bike, li aliyê din jî sozên xwe pêk nayne. Êrîşên cîhadîstan ên li dijî artêşa hikûmeta Sûriyeyê dewam kirin.”

Pispor Yîgît da zanîn ku her ku li Lîbyayê alozî zêde dibe, krîza li Idlibê jî diwartir dibe û DYA di ser hebûna dewleta tirk de daxilî krîza Lîbyayê dibe û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Rûsya dixwaze Tirkiyeyê li cem xwe bigire û nehêle DYA di ser Tirkiyeyê re ji xwe re li Lîbyayê pozîsyonekê çêke. Ji bo ku Tirkiyeyê li cem xwe bigire jî, li şûna Tirkiyeyê ji ber pêkneanîna şertên agirbesta li Idlibê tengav bike, pêvajoyê dirêj dike û ji bo Idlibê tawîzan dide. Lê Rûsya li Lîbyayê hêzeke xurt e ku xetên sor destnîşan dike.” **QAMIŞLO**

## Kêmkirina ava çemê Firatê sûcê li dijî mirovahiyê ye

Rêxistina Mafên Mirovan a Kobanê diyar kir ku dewleta tirk bi kêmkirina ava çemê Firatê re, li dijî mirovahiyê sûc dike û bang li Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî kir. Endama Rêxistina Mafên Mirovan a Kobanê Nesrîn Elî diyar kir ku dewleta tirk li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dijî mirovahiyê sûc dike. Nesrîn Elî, da zanîn ku ava çemê Firatê kêm kirin û bi vî awayî jiyana bi sedhezaran mirovî xistin rewşeke metirsîdar û wiha bi lêv kir: “Dewleta tirk her wiha bi girtina stasyona Elokê ya li Kantona Hesekê bi avê gefê li gelê herêmê dixwe. Dewleta tirk bi vê yekê li dijî mirovahiyê cûd dike. Em bang li Neteweyên Yekbûyî û Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî dikin ku li dijî van polîtîkayên dewleta tirk civîneke awarte li dar bixe. Rê li ber kiryaran bigire." *KOBANÊ*

## Bi hezaran kes li dijî hikûmetê meşiyan

Li Bolîvyayê, bi hezaran kesên ku li ber pêkanîna karantînayê ya ji ber vîrûsa koronayê rabûn, li paytext La Pazê polîtîkayên tenduristî, perwerde û kar ên hikûmeta rastgir şermezar kirin. Di çalakiyê de ku ji aliyê Sendîkaya Central Obrera Bolîviana (COB) ve hate organîzekirin, polîtîkayên kar, tenduristiyê û perwerdeyê yên wekîla serokkomar Jeanîne Anez hatin şermezarkirin. Serokê sendîkayê madenkar Jûan Carlos Hûarachî di çalakiyê de axivî û diyar kir ku gel ji bo vegotina pêwîstiyên xwe li hev kom bûye. Nêzî 4 hezar kes tev li çalakiya protestoyî bûn. Çalakgerên ku li bajarê El Altoyê li hev kom bûn, bi 12 kîlometreyan heta ber avahiya hikûmetê ya li La Pazê meşiyan. Her du bajarên ku meş li wan dest pê kir û li wan bi dawî bû, di karantînayê de ne. Hûarachî got; "Em piştgiriyê didin çalakiyên mamosteyan ên li dijî perwerdeya li ser înternetê û dixwazin ku wezîr (Vîctor Hûgo) Cardenas îstîfa bike." Rayedarekî din ê sendîkaya COB'ê Gûstavo Arce jî bal kişand ser derxistina karkeran ji kar a bi rengekî girseyî û destnîşan kir ku ew vê yekê şermezar dikin. Çalakgeran dirûşmên "Hûn çi dixwazin? Yekser hilbijartinê dixwazin" qîriyan.Tê payîn ku hilbijartinên giştî wê di 6'ê îlonê de bên lidarxistin. Wekîla serokkomar Anez hewl dide bi hinceta şewbê hilbijartinê taloq bike. Anez, pênc wezîr û serokê kongreyê Eva Copa, her wiha gelek karmendên payebilind bi vîrûsê ketine. *EL ALTO*

## Banga bidawîkirina destwerdanê kirin

Li Fransayê nêzî 100 parlementeran bang li serokkomar Emmanûel Macron kir da ku li hemberî plana îlhaqê ya Îsraîlê, dewleta Filistînê nas bikin. 100 parlamenteran bi metna di rojnameya Le Mondeyê de hat weşand wiha got: “Em bang li 27 welatên endamên Yekîtiya Ewropayê dikin da ku dewleta Filistînê nas bikin.” Dihat payîn ku wê Îsraîlê di 1'ê tîrmehê de projeya xwe ya îlhakê aşkera bikira lê hate taloqkirin. Welatên YE'yê, Sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî û Yekîtiya Ereban jî li dijî plana îlhaqê derketin. Li gorî parlamenterên Fransayê divê zext were zêde kirin. PARÎS

# Strana me ya kurdistanî û diyalektîka bindestan

A.Menaf Can

*Ava hemû behran jî birijînin li ser, ez ê ji bîr nekim…*




Homeostasis têgeheke biyolojiyê ye. Mirov dikare jê re pergala yeksengiyê jî bêje. Wexta ku di derdora hucreyan de tiştên neyînî biqewimin, hucre li hemberî wê neyînîyê xwe diparêze. Şert û mercên der dorê çiqas biguherin jî hucre ji bo berdewamiya jiyîna xwe, hewl dide ku rewşa xwe ya heyî biparêze.

Balkêş e ku Spînoza di pirtûka xwe ya Etîkê de: Ku dor bi dor bi rêbaza ciyometriyê ve hatiye îspatkirin de têgehek bikar tîne ku ew jî conatus e: Hewldayîna berdewamiya hebûna xwe. Doktrîna conatusê jî ev tişt peyda dike: Her tişt heta ku wek xwe bibe, xwebûna wê hebe, ji bo hebûna xwe ew ê israr bike. Di kevneşopiya felsefeyê de çavkaniya vê doktrînê jî wek pevgihana Hobbes û Descartes tê binavkirin. Li gorî Hobbes ev hewl ferdîbûna kesayetê ava dike. Çavkaniya vê hewlê hiş e ku ev hewl heya dawiyê bidome. Li gorî Descartes jî mirov dikare bi rêbazên aqlî ve berdewamiya vê hewlê îzah bike. Xwendineke bi vî awayî jî me dibe encameke wiha: Her tişt jî bo hebûna xwe di nav têkoşînekê de ye. Têkoşîna hebûnê yan jî xwebûnê bi berxwedana îmhayê ve kesayeta xwe digire. Di encamê de conatus, di destê Spînozayî de wek homeostatisê tiştekî xwezayî dibe.

Li gorî Spînoza di bingeha hemû hestan de, sê hest hene ku ew jî hêza me ya hebûnê (azwerî), hesta şabûnê û hesta xemginiyê ye. Bi gotineke din hemû hestên mirov di esasê xwe de, ji her sê hestan peyda dibe. Hesûdî, evîn, tirs, kêfxweşî, berîkirin û hwd... Spînoza hestên neyînî li aliyê xemginî, hestên erênî jî li aliyê şabûnê kom dike. Li gorî vê ramanê jî mirov bi xwezayî hewl didin ku ji hewşa hestên neyînî derbasî hestên erênî bibin.

Di sala 2018'an de ji aliyê BBC Newsê ve vîdeoyeke bi navê *How trees secretly talk to each other* ( Dar bi hev û du re çawa bi dizî diaxivin?) hatibû weşandin. Di vîdeoyê de qala têkiliya daran tê kirin. Di der dor û koka daran de karokên mezin dibin hene. Karok ji bo xwedîkirinê alîkarî dide darê, dar jî beramberî vê şekir didê. Piştre zanyar lê dinêrin ku tiştên diqewimin ewqas nîne. Dar bi rêya van karokan di bin axê de adanên (xwarin) xwe bi hev re parve dikin. Darên mê bi vê rêyê, şaxên biçûk xwedî dikin ku şansê jiyîna wan zêde bibe. Darên dimirin an jî nexweş in bi rêya vê tora karokan ve adanên xwe derbasî cîranên xwe yên bitendurist dikin û bi vê jî têr nabin ku wexta nebatek rastî êrîşek bê hev û du bi vê torê hişyar dikin. Lê belê wek torên homo sapiensê aliyên tarî yên vê torê jî hene. Hinek cureyên orkîdeyê diziyê dikin û cureyeke dara gûzan heye ku jê re gûza reş dibêjin, ev jî jehra kîmyevî berî serê reqîbên xwe dide.

Di mînaka têkiliyên daran de hem di navbera daran de hem jî di navbera dar û karokan de danûstandinek jiyanî heye. Niha li vir dar jî karok jî orkîde jî gûz jî wek figurên conatusê derdikevin pêşiya me. Ji bo berdewamiya hebûna xwe hewl didin, parve dikin, xwedî dikin hinek cureyên wan hene ku ji heman sedemê dizî û kujeriyê dikin… Tiştên ku dikin diguhere lê li vir armanc heman tişt e ku ew jî hewldana berdewamiya hebûna xwe ye. Lê di vê mînakê de tişta herî balkêş ev e ku di nav nûnerên wê civakê de darên ku dirizin an jî dimirin tiştên ku bi hebûna wan ve giredayî ye (adan) civaka xwe re – heke em wek civakek bi nav bikin parve dikin. Bi awayekî din di vê mînakê de her çiqas îstîsna hebin jî tiştên ku bi kêrî civakê û endamên wê civakê tê; "Mirov qenciya xwe veşarî jî be gere di qenciya kesên din de bibîne." Li gorî Spînoza encax bi vî awayî mirov dikare ji heqê şabûneke ebedî derkeve. Lê ez ê paşê li ser vê xalê bisekinim.



Niha li erdnîgariya Rojhilata Navîn bi dehan rexistinên çekdar hene. Ji bo ol, netewe, çand û hwd… têdikoşin. Di nav wan de rêxistinek heye ku zêde balê dikişîne; Tevgera Azadiya Kurdan e. Ji 40 salan zêdetir e, li ser ax û warê kurdan têkoşîneke çekdar dide. Di cîhanê de wek tevgera herî mezin tê ber me. Destpêkê bi îdeolojiya marksîst û lenînîst xwe ava dike; pâşê bi konfederalîzma demokratîk jî xwe nûjen dike. 'Dewletê yan jî desthilatdariyê naxwaze' û rastiyek wê heye ku bi piştevaniya gel li ser piyan dimîne û roj bi roj bandora wê zêdetir xuya dibe. Bi sed hezaran endam û bi milyonan jî alîgirên wê hene. Ev hêzeke pir mezi e. Ew hêza xwe ya bêhempa ji ku digire? Li ser çend mînakên li ber çavan mirov dikare zelaltir qala vê mijarê bike.

Niha di nav kurdan de çend sloganên bi nav û deng hene; berxwedan jiyan e … Peyvên wek hebûn, têkoşîn, berxwedan, xwebûn balkêş e ku di nav civakê de zêde cih girtine. Ya rast di civaka Kurdistanê de zêde bikaranîna van peyvan, dibe sedema xeteraya li ser hebûnê. Bi taybetî mirov ji bo daneyên hebûna vê xetereyê jî arşîva rojnameya Cumhuriyetê dikare wek çavkanî nîşan bide ku meraq nekin hûn ê rastî arşîveke xurt û dîrokî bên. Niha em li ser çend dîmenan bisekinin.

Di sala 2011'an de li ber çemê Dîcleyê ciwanekî 17 salî bi çalakiyekê xwe dişewitîne. Li ber laşê wî yê bêcan kaxizek tê dîtin. Di vî kaxizî de jî *laşên dişewitin, ew ê tarîtiya 15'ê Sibatê ronî bike* hatiye nivîsandin. Li ber avê! 15'ê Sibatê jî ji hêla gelê Kurdistanê ve wek komploya navneteweyî tê binavkirin. Di civaka Kurdistanê de rastiyeke fedaîtiyê heye. Her çiqas rêveberên tevgera azadiyê li hemberî van çalakiyan bertekên neyînî jî nîşan bidin, di dîroka tevgera azadiyê de cihekî wê yê girîng heye.

Niha li jor hem di têgehên Spînozay de, hem di têgeha homeostatîsê de hem jî di mînaka daran de qala hewla berdewamiya hebûn hatiye kirin. Lê mirov 'xwekuştinê' di têgeha conatusê de çawa dikare binirxîne? Em niha berê xwe bidin Camus: "*Xwekuştin pirsgirêka herî girîng e ku mirov li ser bifikire.*" Di strana me ya Kurdistanê de mîrateyek heye ku bêmade ji bav û qalan derbasî nifşên nû bûye. Welatek wêran, xemginiya dar û kulîlkan û metirsiya ajalan ketiye para nifşên nû. Di vê mîrateyê de jî, piraniya hestên civakê, li aliyê xemginiyê kom bûne. Hem di kesayetên xwe de hem jî wek civakek, bi rebazên cur bi cur ve hewl dane xwe ji hestên neyînî bifilitin û bikaribin barê rewşa xwe ya neyînî derbasî asteke erênî bikin. Li vir xemgîneyeke dîrokî heye ku ew jî li hemberî conatusê astengiyeke kûr derdixe holê. Niha di çalakiya xweşewitandinê de jî her çiqas wek çalakiyeke îdeolojiyê xuya bike jî çalakger li vir ji ber rewşên heyî nikare bijî. Bi awayekî tund di bin bandora xemgîniyeke dîrokî û civakî de ye. Û daxwazeke pir mezin jî pê re heye ku ji bo wê daxwazê dev ji jiyana xwe berdide. Çalakiyeke bi vî awayî jî hêviyekê derdixe holê ku ew jî di mînaka civaka daran de veşartî ye: "*Darên ku dimirin, adanên xwe bi darên din re parve dikin.*" Qêrîna çalakger jî li vir rasterast bi hewldayîna hebûnê ve giredayî ye. Ew qêrîn û hewla hebûnê, bi agirekî mezin xwe li civakê parve dike ku bi roniya xwe civakê xwe hişyar bike. Çalakiyên bi vî awayî her çiqas bi tundî rast neyê dîtin jî, di hêla analojiyê de ji hewlên sazî û dezgeyên kurd bigirin, heya ji pênûsa rewşenbîran ji kenê zarokan bigirin heya çalakiyên Dayikên Şemiyê dişibin hev û li vir armanc yek e. Ew jî hewla berdewamiya hebûn û xwebûna xwe ye. Heke mirov li vir qala îdeolojiyê bike ew jî rasterast hebûn û xwebûn e. Her çiqas civak tiştekî homojen nebe jî, di nav wê civakê de kesên ji bo takekesiya xwe wek dara gûza reş tevbigerin jî, şadbûn di hewleke hevpar de veşartî ye. Divê hewldan, serê derziyek an jî bi qasî çiyayekî be jî, Kurdistan rasterast wek figurên conatusê derdikeve pêşiya me, lewma jî çîrok li Kurdistanê tim çîroka li ser piyan mayînê bûye.

# Tirşikçî

Seyidxan Anter

Gotina tirşik bi kurdî ye. Tewandina çî jî, bi qasî tê zanîn bi tirkî ye. Ev peyv zêde li herêma Rihayê bi kartînin. Lê li Sêwregê bûye bûyer, bûye dîrok. Û dûra jî gihiştiye ber destên 'Türk Dil Kurumu'. Her wiha têgeha 'tirşikçi' di ferhenga tirkî de cih girtîye. Ango wek gelek tiştên din ciwanmêran ji me dizîn.

Helbet her rûdaw, bi serê xwe, li warekî şikil distîne û form digire. Em li wir ne behsa xwarinê lê ya bûyer û fenomenek civakî û polîtîk dikin. Îcar gotina 'tirşikçî' beriya sala 1978'an zîl daye. Di dema germ a pevçûna siyasî de ji kesên bê biryar û du alî dilîstin re dihat gotin û tê gotin.

Em vegerin Sêwregê. Sala 1978'an bûyerek rû da. Ferîdê Brodirej (Ferît Uzun) li Sêwregê hate kuştin. Ew hem bi siyasetê dadiket, hem şair bû hem jî di nav nifşên tevgera azadîxwaz a kurd a salên 70'yî de, berê li Enqereyê, piştra li Sêwregê û seranserê bakurê Kurdistanê xwedî cihekî naskirî ye.

Li gor şor û nûçeyên li nav xelkê, belav bibûn û dihatine gotin, kuştina Ferîdê Brodirêj dixistin stûkura eşîra Bucakan, her çiqasî serokê eşîra Bucakan Mehmet Celal Bucak digot; ne me kuştiye jî. Li gorî belavoka KAWA ya li ser bûyerê, dewleta tirk Ferîdê Brodirêj kuştiye. Û ji xwe hêzên dewletê yên tarî jî di kozika xwe de bûn. Çîrok dûr û dirêj e. Bûyer an jî destpêka rûdawê wiha ye; dema ku Mehmet Celal Bucak li gundê Bazînê ku devleta tirkan navê wê kiriye "Kirbaşi", diçe serdana xezûrê xwe, şoreşgerên tevgera kurd bi çekan dora gund digirin. Hin kes tên kuştin û birîndar dibin. Bi vê bûyerê re bajarê Sêwregê dibe du beş. Şer 20 mehan didome û derbasî hin cihên din dibê. Dewleta tirk (TC) li hemberî vî şerê di nav kurdan de yê li Sêwregê û cihên din, çavên xwe digire. Û jixwe dewlet li mahnên darbeya leşkerî ya 1980'yan digere. Di vê demê de hejmara tirşikçiyan li herêmê zêdetir dibe.

Rê bidin min ez xalek dîrokî bi bîr bînim. Hîn di serdema Osmaniyan de, li sê heremên Kurdistanê, Amed, Riha û Mêrdînê ji merkezê, ê mîna Waliyên îro û paşayên berê berpirsiyarê dewletê tayîn dibûn. Her wiha dûra jî, serdema komara tirk de ji bo ku eşîr li ser lingan bimînin û pêwendiyên eşayirtî dom bikin û tirşikçî zêde bibin, dewletê xwe gelekî êşandiye. Li ber feratê, li herêma Mêrdînê (ku dema berê qismek ji herema Botanê jî bi ser ve bû) TC imtiyaz, alikarî û geşt didan serokeşîran.

Em cardin vegerin Sêwrega xwe. Mihemedê Kûriya, bi şelwarê kabardîn, şifqa neh koşe, êlegê çil qumçe, qundira sertûj û bi kabik, çaxa ku vedixwar û azad dihizirî wisa digot: "Min beriya 15 salan tirşik xwar. Ev çardeh sal in jî bi sabûn û torsîlê dişom naşom jê nare, ketiye nav xûnê. Ez rica dikim nexwin!"

Nebêje te negot ha...!!!

# Vîrusê Coranayî: Bedelîyayişêko radîkalî û etîkê kaosî

Welat Ramînazad

Emrê dinya mîyanê şeş û hêşt mîlyaran serrî de ya û destpêka xo ra nat zî ha evolusyon bena. Prosesê evolusyonê de sey felaketanê îklîmî, nêweşîyanê coreyî, xela, problemanê cugehî û sewbîna çîyî zaf reyan qewimîyayî do zî biqewimîyî. Kê ke wayîrê hişwerî û zanayişê evolusyonî bîyî kê no tewir bîyayişanê normal vênênî. Qewiyayişê no çîyan sey qanunê yo, çîyî ke nêpawiyayeyî û deraseyî nîyî, xora qewimîyayişê înan ra xelas zî çin a. No qewimîyayişanê ra tayê dinya de benî sebebê bedelîyayişanê radîkalî. Ma însanî cînsê xo zî deyndarê no hawa yew qewimîyayişê îklîmî ye.

Dinya de verî cû sey însanî gandar çînî bî. 70 mîlyon serrî verî dinya de hetê îklîmî ra bedelîyayişêko radîkalî virazîyêno, netîceyî no bedelîyayişê sey dînazoran û gelek cînsê bînî vîn benî la prîmatî; cînso ke tewr kalikê însanî sifteyîn hesibîyêno, vejîyêno orte. Nayê ra pozîtîfeyê û negatîfeyê netîceyî no bedelîyayişan goreyê cînsanî vurrîyêno no semed ra netîceyanê bedelîyayişan teyna negatîf vênayiş problemîn o.

Prosesê evolusyonî de hata verî peydabîyayişê û zêdebîyayişê cînsê Homo Sapiensî seyîrê evolusyonî naturel û xo bi zo bîyênî. Labêla Homo Sapiensê ke dinya de peyda bî, dest bi mudaxaleyê hukimkerdişê dinya kerdî, waştî ke aye dekewo bînê hukimê xo nayê ra seyîrê naturelê evolusyonî xerepna û lezgînîya bedelîyayişanê radîkalî zêdinayî. Bitaybetî zî hîrî sey serrîyanê peyên de, kapitalizmê ke bî sîstema dinya, mudaxaleyî însanî ser o kontrolkerdişê xoza de zaf hetan ra zêdiya û gelek giran bî. Netîceyî ney de xoza de taxrîbato pil virazîya. Rîdî no taxrîbatî ra zaf felaketê radîkalî estê ke ha pawênî însan û gandaranê bînanî. Çend aşmî yo ke însanê dinya pêro pîya bi nameyê Corana Vîrus ha felaketek ciwîyênî.

Çend aşmî ra verî hewa verîn Çînî de bi nameyê Vîrusê Coranayî nêweşîyêka coreyîya neweyî vejîya orte û dima ra zî hima hima vilayî heme dinyayî bîyî.

Dinya de şok viraştî û bîyî sedemê gelek krîzan sey tibî, ekonomîk, sosyal… Pergala zemanê welatanê dinya, cuya rojanê û têkilîya însanan û ekonomî rijnayî û bedelnayî. Hetê ekonomî ra krîzek gird viraşto; gelek însanî bê karî mendî; zafanê însanî Coranayî ra nîyî tersênî ke vêşanî ra bimirî, zafanê kargehî padiyayî. Rêbenîya tibê, ê hende vatênî tibî averî şîya la tipa heme welatanê dinya hata nika zî nêşêya na nêweşî ra darû û aşî biveynî. Hezaranî însan bîyî nêweşî, zafanê înan zî merdî… Însanî nêşênî keyeyanê xo ra bivejî ha mîyanê nêdîyarî de bi ters û endîşan pawênî. Bedelîyayîşê ke Vîrusê Coranayî viraştî, a ke bi temamî qediyayî, encaxî o wext ma bişî netîceyanê aye bi zelalî biveynî. Labêla hawa ke vajîyêno hem "dinya hînî sey dinya verî nêbeno" hem zî semeda feqiran Coranaya raştîkînî, na Coranayî ra dima dest pê bikero.

Sey evolusyono çerxkî û averberdî di tewirî ekolê evolusyonî estî. Goreyê averberdî dinya û cuyî tim her hetê tewr başî û rindî ra şona, goreyê çerxkî zî dinya û cuyî her vîstî îhtîmal esto ke newe ra bibo sifirî û biageyro destpêkî. Mamosteyek mi, dersêkê xo de vatibi, "dinya encax bişo bi felaketêka radîkalî biageyro destpêka xo".

Gelo Corana Vîrus bişo dinya bedelîyayişêko radîkalî bivirazo? Gelo semeda ke potansîyel û qudretê Vîrusê Corana esta ke dinya biageyrîno destpêka xo?

Slavoj Zîzek nuşteyêke xo de vatibi "na çoreyî bibo sedemê peynî amêyişê kapitalîzm û sîstemê dinya bibo komînîzm". Sebaretê no tesbîtê Zîzek mûqaşeyî hama zî ha dewam kenî...

Goreyê mi, hem qudretê Vîrusê Coranayî çîn o ke dinya biageyrîno destpêka xo hem zî nêşo dinya de bedelîyayişêko radîkalî bivirazo. Çimkî çoreya Vîrusê Coranayî de amêya kontrolkerdiş; eka na çoreyî pêtêr xidarêr bîyanî nika zî hama Çînî de dewam kerdênî, dinya de rîdî averkewtişê tibî ra ma şîyênî bivajî ke tibê na nêweşî ra derman biveyno la eka derman nêşo bêro vênayişê zî bîyolojîye însanî adepteyî na nêweşî bibo; na nêweşî ê hende biqudret nîya ke bişo cînsê însanî çin bikero.

Labêla her gamî îhtîmal esto ke no tewir bîyayiş biqewimîyî. Vîrusê Coranayî bêro kontrolkerdişê la eka ma wina bikerî û xo raşt nêkerî mêşt û borî felaketê hîna gird ha ma pawênî. Ma Vîrusê Coranayî ra nêtersî ma Germîya Globalî, tivinganê nukleran ra bitersî…

Xelasîya ma çi netîceyî sewbîna bobelatan çi zî ê Vîrusê Coranayî çiqas giran û xidar benî wa bibi ganî ma hesewrîya ciwîyayişê her tim berz û geş bikî, fekverranêdayişê hiwîyayiş, reqisnayiş; dans û govendkerdişê û dinya de înşakerdiş û tayînkerdişê qanunê etîko qaînatî û etîkê kaosî de yo. Teyna etîkê qaînatî bes nîyo ganî ma etîkê kaosî zî înşa bikerî. Wexto ke ma no etîk înşakerdişê tersî û endîşeyî xo rê xoverî çareser benî. Xora çayo ke tê de etîk çîn o ewca de ters û endîşe estî. Nayê ra ma ganî hewna biageyrî Kant serî. Etîkê ku bi temamî edelatî înşa bikero. Etîkê ke teyna heqê însan nîyî etîko heqê heme û gandaran û çîyanê bînan zî bisevekno. Etîko ke hişwerîya barkerdişê û redkerdişê îhtîyacê xo ra zêde nêgirewtiş dano ma.

Edebîyat û sînema de bi nameyê zanisto viraşte beşek virazîyayo. Zafanê teorîye kompleyê qewiyayişê felaketê îklîmî, xozayî, cugehî romanan û fîlmanê no beşî rê benî babetî. Mavajîm ke senaryoya tewr tersnak û xirabe qewimîya, dewlatî kontrolê xo vîn kerdê, kaos vejîyayo, "însan bîyî vergê însanî", însan yewbînî qir kenî… Ters û endîşeyê no hawa senaryoyan binhişê heme însanan de estê. Strukturê zanisto viraşte de zî no ters û endîşe estî û o xo ser tîya ra awan keno. Corana Vîrusê na tersî û endîşeyî kerdî şenberî, tîya ra pey însanî hîna zaf bitersî û bibî paranoyakî. Gelo no berheman de etîkê kaosî çiqas esto, amêyo tayînkerdiş? Hata nika no tewir berheman de mi qe îmareyê etîkê kaosî nêdî, heminê înan de xelaskarêk estibi. Ganî Vîrusê Coranayî ra dima hînî herînda xelaskaranî etîkê kaosî bigîro. Etîkê kaosî tîya ra xo dest bi tayînkerdişê bikero.

Her çî ra verî ma etîko qanîatî; edealetbîyayişê cuya xo de înşa bikerî. Herkes xo ra mesulîyetdar o: Beno ke "cuya xelet raşt nêna ciwîyayiş" la ma teyna serê xo bî zî ganî ma fek ciwîyayişê cuya raştî- etîkî ra ver ra nêdî.




# Sînorê şîdetî nêmendo

Valêre

Nê rojanê xeylê zor û zehmetinan ke ma tede vîyarenî de her hetî ra û her tewir şîdet virazîyeno. Prosesê vîrusî hetê her şexsîyet û organîzasyono ke meîlê înan yê şîdetî esto ra sey firsend yeno vînayene û kerdenanê xo bi asanî dekenî dewre. Merdimîye cayo ke nê rojanê zor û zehmetinan de biba yew veng de bîya lete lete. Qanûno ke vîrus de seba hepsîyanê edlîyan vejîya, zîndanan vend kerd û herinda înan de bi kesê ke tu qebehetê înan çin o ameyî dekerdene. No zî tewirêkê şîdetî yo. Şîdet tena kuwayîş nîyo. Reyna tewr zêde rojnamegerî ameyî tepiştene û taybet zî rojnamegerê cinî yenî girewtene. Êdî kutikan verdenî cinîyan ser û bedenê înan bi kutikan lete lete kenî. Êdî şîdet sînoran nas nêkeno û sînorê şîdetî nêmendo.


Sewbîna zîndanê Tirkîya nika bi doman û cinîyan dekerde yî. Edlî serbest ameyî veradayene û cinîdoman yenî tepiştene. Eylem Oyunlu tewrê domana xo ya 2 serrî û domana xo ra 10 rojî erzîya zîndan. Zanist de zî yeno vatene ke ganî cinîya vîyaye heta 40 rojî baldar biba. Reyna vatişêk verênan yê kurdan esto; vano 'Mezelê cinîya vîyaye heta 40 rojî akerde yo'. Cinî heta aye wext her tewir nêweşî rê akerde ya. Coka ganî zaf baldar têbigêra û ganî werdê aye cinî cîya biba. La ma înan kamî rê vajî? Her çî hetêk de wijdanê merdimî daxî nêtepişeno ke merdim domana 10 rojî dekera zîndan. Eylem ra dima reyna Mêrdîn de cinîyêk tewrê domana xo erzîya zîndan. Nê wirdî cinî tena nimuneyê rojanê peyênan î. Homa zano çiqas cinîyê ke na rewşe de yî estî.

Wexto ke ez nê cinîyan vînane ya zî eşnawena filmêk kehen ê tirkan ê bi nameyê 'Uçurtmayı Vurmasınlar' yeno mi vîr ke reya verêne mi domanîya xo de temaşe kerdbî. La ez zana ke rewşa cinîyê kurdî ke zîndanan de yî zî hîna xirab a. Çimkî wexto ke kurd yeno vatene muameleyêko cîya keweno kewre. Seke mi cor de zî nuşt bî merdiman ser de veradayîşê kutikî.

Dîmenê domano ke taxa rezan de polîsêk kiştbî û bado ke ameybî tepişte çî ci rê ameybî kerdene vîrê merdimî ra nêşono. Wexto ke merdim nê çîyan dano têver merdim vîneno ke şîdet sînoran nas nêkeno û sînorê şîdetî nêmendo.

Wexto ke hêz keweno destê merdimî merdim şaş beno nêzano se bikero. Qezaya Qubînî ya Êlihî de domana bi nameyê Î.P.ya 17 serrî raştê tecawizê çawişo pispor M.O.yî ameye û waşte ke xo bikişa. Dêrsim de 3 polîs û meleyêk heqaret bi cinîyan kerdî û dîmenê ê gaman serê medyaya komelkî de pare kerdî. Çewlîg de xokiştişê cinî-domanan û Agirî de îstismarkerdişê domanan. Nê pêro çîyî tewirê şîdetî yê û bi destê îqtîdarî yenî kerdene. Yanî merkezê nê heme xirabîyan yew o. Awankar û rayberdişê înan zî yew o. Eke kerdox biameyêne cezakerdene ya zî tepiştene do nê hedîseyî hende nêzêdîyayêne. La tîya de herinda cezakerdişê de nê kesî serbest yenî veradayene û merdimîye înan vera tehluke de ya.






# Rojiya rovî



Rojekê li daristanê roviyek digere. Digere lê ji birçîna xurexura zikê wî ye. Ji nişka ve li binê darekê hêtek goşt dibîne. Li dora goşt diçe tê, dibîne ku bombeyek bi goşt ve girêdayî ye. Difikire eger dest dirêjî goşt bike, wê bombe biteqe û pê bimire. Lê nêta rovî tune ku dev ji goşt berde. Rovî ji goşt hinekî dûr dikeve û li ciyekî disekine. Wê gavê gurek ji wê da tê. Ji Rovî dipirse:

Birayê rovî di binê wê darê de hêtek goşt heye çima tu naxwî? Rovî bersiva wî dide:

Spas dikim birayê gur. Ez îro bi niyet im, min rojî girtiye li benda fitarê me. Lê eger tu birçî yî, ji xwe re bixwe.

Gur bombeyê nabîne, hema êrîşê ser goşt dike. Ji nişka ve bombe diteqe û goşt li aliyekî gur li alîyekî dikeve. Rovî hema dajo ser goşt û dest pê dike dixwe.


Gur di nav xwînê de, nalenala wî ye. Dema ku dibîne Rovî ketiye ser goşt dixwe, serê xwe bilind dike û ji rovî dipirse:

Birayê rovî ka tu bi rojî buyî, çima te rojiya xwe şikand? Rovî wiha bersiva wî dide û dibêje:

Birayê gur ma te nebihîst, top teqiya fitarê dest pê kir.

*Fikrî Amedî*

## XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Mezin, cihê ji erdê bilind 3. Erdê ne bejî, yê tê avdan.
5. Keser, nalîn 6. Awa 7. Alan 9. Hunermendeke kurd, di wateya aşiq de
12. Giloka ta, an jî giyayê hûnandî 14. Cejin 15. Zengîn 17. Vexwarina herî sereke 18. Bersiva neyênî
22. Zimanzan.

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Tev, bi temamî, hemû
2. Rih 3.Yan, yan jî 4. Kar, xebat
5. Sembola jinên kurd a berxwedana Kobanê
7. Cêrî, berdestka xizmeta malê dike 8. Alaveke kevin a çandiniyê, pê nîsk tên çinîn 10. Ax, zemîn
11. Şanenava ku ji ber navekî tê nivîsandin.
13. Meha nehem a zayînî
14. Perestin, perestî
16. Lewre, ji ber ku, ji ber wê
19. Kok û reha kurd, faris û hin gelên din 20. Kurt, ne dirêj
21. Di lîstika kaxizan de karteke girîng 23. Tûj, har

**Bersiva hefteya borî**




## Hindik û Rindik

Fewaz Evdê

# Kuna dîwar

Çû ba Mele û jê re got: Seyda, kêşe/problemek di nav me û cîranê me de heye, bi hêvî me tu çaryekê ji me re bibînî!

Mele got: Xêr e? Çi heye?!

Got: Dîwarê di navbera me de, kunek tê de heye û tê re li me dinêrin! Ka em çi bikin?

Mele got: Ji aliyê xwe ve bigirin, nema karin we bibînin.

Got: Ma ne ku em bigirin, nema em wan dibînin seyda!



# Xalo tu jî bireve

Carekê di kolanê de dimeşiyam, min dît zarokek dixwaze li zengilê malekê bide lê destê wî nedigihayê. Çav li min ket got:
Xalo ka ji min re li zengilê bide. Min tiliya xwe danî ser zingilê. Bi çirîniyê re wî bazda û got: Xalo tu jî bireve!
Min digot qey ew diçe mala xwe û destê wî nagihîje zingilê derî. Tu nabêjî bêjiyo li deriyê xelkê dida û direviya.



# Kuro navê xwe nebêje

Dawiya salên heştêyî bû, hêm xort bûn. Ez û du hevalên xwe, em çûn gundekî Aşîtya. Zarok li ser bênderan dilîstin. Hevalê min li navên wan pirsî. Yekî got: Alan. Yê din: Şivan, Rodî, Berzan,... Giha yekî û berî rebeno navê xwe bêje, yekî din ji dûr ve bi dengê bilind bang kir: Kuro Welîdo navê xwe nebêje!

# Kovara zanist û erdnîgariyê: Parzemîn

Felat Nishtiman

Komeke ji zanyar, mamoste û wergêran pêk tê, ji sala 2010'an vir ve bi zimanê kurdî (kurmancî, kirmanckî) xebatên li ser zanist, erdnîgarî û teknolojiyê dike. Komê bi kovara bi navê Zanko ya bi awayê PDF li ser înternetê, dest bi karê xwe kiriye. Piştî çend hejmaran navê kovarê guherandine kirine Parzemîn.

Berpirsê malper û medyaya civakî ya Parzemînê Weysel Karabulut diyar dike ku armanca xebatên wan a sereke, belavkirina hişmendiya zanistê ya bi zimanê kurdî ye û dibêje: "Em dibêjin 'divê tu hevokeke li ser rûyê dinyayê nemîne ya kurdiya wê nehatibe gotin. Sê armancên me hene: Yek ziman, du zanyarî û ya sisêyan jî standardîzekirina hevoksaziya zanistî ye. Helbet em dixwazin zanist û erdnîgariyê yên ji bo pêşeroja mirovahiyê jêneger in, bi gelê me bêhtir bidin hezkirin û karibin hişmendiyeke çêtir li ser parastina xweza û jîngehê ava bikin."

Weysel Karabulut destnîşan dike ku di warên edebiyat, çand, huner û gelek mijarên din de kovar û xebatên curbicur hene lêbelê li ser zanist û teknolojiyê gelek hindik in; ji lewra wan xwestiye vê valahiya zimanê kurdî dabigirin. Karbulut her wiha amaje pê dike ku hema bêje xebatên zanistî û teknolojiyê bi hemû zimanên serdest ên diyayê tên kirin, loma girîng e bi zimanê kurdî jî ev xebat bên kirin.

> Berpirsê kovara Parzemînê Weysel Karabulut dibêje ku bi kurdî xebatên li ser zanistê kêm in û armanca wan belavkirina hişmendiya zanistê ya bi zimanê kurdî ye

Karabulut ji bo globalbûnê jî dibêje, zimanê kurdî birçî û bendewarê globalbûnê ye û wiha didomîne: "Belkî em nikaribin bibin pireke tekûz lêbelê em dikarin bibin stûneke vê pira zanyariyê. Em di her warî de xebatên xwe bê berdêl dikin. Globalîzm ji bo zimanan mecbûrî ye û helbet em jî dixwazin bibin kevirekî biçûk ê vê hewldanê."

Têkiliya kovara Parzemînê bi kovara National Geographicê re jî heye û wê mafê bikaranîna naverok û daneyan jî bi awayê fermî bi dest xistiye. Karablut bi lêv ku ew bi hêvî ne, wê dikaribin di demên pêş de kovara Parzemînê wek "National Geographic Kurdî" derbixin û didomîne: "Tevî ku statûyeke zimanê kurdî ya fermî tune ye jî, National Geographicê destûra bi kurdî da. Ev bi serê xwe ji bo zimanê kurdî serkeftinek e. Gava aliyê fînansî jî çareser bibe em bawer in dê kovara National Geographic bi kurdî jî derkeve."

Weysel Karabulut der barê plansazî û xebatên wan ên ji bo pêşerojê de jî dide zanîn ku ew hewl didin belgefîlmên kurt û dirêj bikin kurdî û ev tişt dibêje: "Em hewl didin dublaja wan belgefîlman bikin da ku bibin çavkaniyeke dûvedirêj a zanistî ya bi zimanê kurdî. Em dixwazin belgefîlmên kêrhatî yên alema zanistê bikin kurdî. Ji daxwazekê wêdetir xebat tên kirin û xebatên me didomin."

Karabulut herî dawî diyar dike ku ew dixwazin xebatên wan bibin çavkaniya herî hêsan a ji bo xebat û lêkolînan û her wiha pêşniyar û rexneyên ji bo kovarê tên kirin jî motîvasyona wan a kar zêde dike û ew pê kêfxweş dibin.




Kovara Parzemînê heta niha bi awayê kaxiz tenê hejmarek çap bûye û tevî hejmara çapkirî heta niha 6 hejmarên kovarê derketine. Kovar li ser malpera Parzemîn Solutionê (parzemin.com) jî belav dibe û yên bixwazin dikarin li ser vê malperê xwe bigihînin kovarê û wê daxînin. Her wiha bi awayekî çalak li ser hesabên tevnên medyaya civakî jî xebatên kovarê bi rêk û pêk tên parvekirin.

# Kurd berê xwe bidin lîstikên bi kurdî

Navenda Nûçeyan

Leyzok, sepana lîstikeke bi zimanê kurdî ye û ji aliyê Ferhat Baysal ve hatiye amadekirin. Ferhat Baysal du meh berê wekî gelek kesan di rojên pandemiyê de berê xwe dide zimanê dayikê û dest bi avakirina aplikasyona bi navê leyzokê dike. Di bin sîwana navê Leyzokê de bi kategoriya 'pirs'ê dest bi amadekirina lîstika bi kurdî dike. Der barê naveroka sepanê de Baysal wiha got: "Ya rastî gelek projeyên min hene ku di bin sîwana Leyzokê de gelek lîsktikên kurdî ava bikim ku kurd jî bibin xwedî lîstikên dijîtal û bikaribin bi hev re bilîzin."

Ferhat Baysal ji Kerborana Mêrdînê ye û niha li Belçîkayê dijî. Li Belçîkayê karên Endezyariya Nivîsbariya Kompûterê û karên dîzayna dijîtalê (photoshop) dike. Baysal der barê aplîkasyonê de bal kişand ser kêmasiyên lîstikên dijîtal ên bi kurdî û diyar kir ku bi sedema her kurdek bi zimanê xwe jî lîstikan bilîze ev lîstik amade kiriye.

**Lîstikên nifşên nû**

Avakarê sepana Leyzokê Baysal bal kişand ser pêdiviya lîstikeke bi kurdî û diyar kir ku êdî nifşên nû zêde ji nivîsên dirêj hez nakin û ji ber vê yekê jî wî berê xwe daye ser xebateke bi vî rengî. Di axaftina xwe de Baysal ev tişt anî ziman: "Gelek ciwan êdî wextê xwe bi telefonan derbas dikin. Bi lîstikên biyaniyan dilîzin û tenê hînî çanda wan dibin. Êdî bila kurd jî berê xwe bidin lîstikên bi zimanê xwe. Kesên dixwazin ji hînbûnê kêfê bistînin û bi hevalên xwe re bikevin pêşbaziyê, dikarin vê aplîkasyonê bi kar bînin."




**10 hezar pirs bar kirin**

Leyzok lîtikeke ku bi du kesan bi hev re tê lîstin. Di hundirê lîtikê de pirsên têkildarî sînema, şano, bawerî, werzîş, erdnîgarî, naskirina kesan, ziman, wêje, dîrok, muzîk, gotinên pêşiyan û gelek beşên din ên li ser zanîna çandên biyanî hene. Ferhat Baysal heta niha 10 hezar pirs lê bar kirine û dê her biçe pirsên xwe zêde bike.

Di axaftina xwe de Baysal da zanîn ku her ku diçe rastî eleqeyeke baş tê û ji bo ku Leyzok hê bi hêztir bibe, kesên dixwazin dikarin pirsan amade bikin û wiha domand: "Gelek kes ji bo Iphonê jî dixwazin, min ji bo IOS'ê jî şandiye lê li benda erêkirinê ye. IOS ne weke androîdê ye, erêkirina wê piçek dem dixwaze. Di demeke nêzîk de ji bo Iphoneyê jî wê were bikaranîn."

Ferhat Baysal ji bilî Leyzokê ji bo zarokan jî lîstikeke kurdî ya bi navê "Stêrgerê Kurd" amade kiriye û kesên dixwazin jî dikarin ji "Play Store"yê daxînin telefona xwe.

Her wiha Baysal bi navê "Copy Paste" xebatek li ser youtubeyê jî daye destpêkirin. Di vê xêbatê de jî stranên ku ji kurdan hatine dizîn bi awayekî otomatîk tên qeydkirin û têkildarî vê yekê Baysal diyar kir ku bi vê xebatê jî stranên ji kurdan hatine dizîn wê wan derxe holê.



Mertal

SelîmTemo

## Kirmanc û Kurmanc, Kirmanciyê û Kurmanciyê

Soranên Başûr ji Kurmancên Başur ra dibêjin Behdînî. Soranên Rojhilat ji Kurmancên Rojhilat ra dibêjin Şikakî/Celalî. Lê Behdînî ji xwe ra dibêjin Kirmanc, Şikakî/Celalî dibêjin Kurmanc. Kurdên Xorasanê bo xwe peyva Kurmanc bi kar tînin û di proseya nû da bo welatê xwe dibêjin Kurmancîstan. Dêsimî/Dersimî û Ezirganî bo xwe Kirmanc dibêjin, xwe Kirmancên xas dihesibînin û Kurmancên Kurmanc bi peyva Kirdas/Kirdaş bi nav dikin, yanê "yên dişibine Kurdan."

Ehmedê Xanî. Di *Nûbihara Biçûkan* (1683) da dibêje, "Ne ji bo sahibrewacan / Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan." Gelo li vir "Kurmanc" Kurd in an kesên hejar û feqîr in? Bi raya min ya diduya rast e. Bala meriv dikşîne ku dijayetî heye di nav sahibrewac û Kurmanc da.

Muzaffer Ilhan Erdost, di sala 1963yan da leşker e li Şemzînanê. Bîranîn û çavdêriyên xwe bi çavê oryantalîstekê perîferîk û bi navê *Şemdinli Röportajı* (Reportaja Şemzînanê) diweşîne (1986). Li vir wateya peyva "Kurmanc", "neeşîr" û "bêmilk" e. Jixwe di nav Kurdan da dubendiya "eşîr" û "Kurmanc" heye û te dît Xanî di *Mem û Zînê* (1694) da dibêje, "Belkî bi te'essub û 'eşîrî."

Kurmanc ew kes in ku her ji ber çi be ji eşîra xwe ya berê qut bûne û xwe spartine eşîreka dî. Ne-eşîr, bêmilk û kole ne. Gava yek li dijî neheqiyê radibe, dibêje, "qey ez Kurmancê bavê te me?" Li vir êdî em têdigihên ku qesta Xaniyî çi ye. Lê di *Mem û Zînê* da qesta wî ji Kurmanc dibe Kurd: " Ez mame di hikmeta Xwedê da / Kurmancî di dewleta dinê da."

Ez werim ser Kirmanciyê-Kurmanciyê. Em li Dêsimê dibînin ku piraniya civaka Dêsimî bo warê xwe dibêjin Kirmanciyê. Di esasê xwe da qesta jê warê Kirmancan/Kurdan e, yanê Kurdistan e lê were û têxe serê munkîrên çavlidewletê. Digel ku Dêsima berê perçeyek ji mîrektiya Çemîşgezekê bû û Şeref-Xanê Bedlîsî, di *Şerefnameyê* (1597) da digot, "gava peyva Kurdistan tê hildan, qest jê pêşiya pêşî Çemîşgezek e."

Nivîsa Uxur Sermiyan a bi navê "Namekerdişê Dêrsimijan" *(di nav Yazınsal Varoluştan Akademik Literatüre Kırmancca (Zazaca)*: M. Malmisanij'a Armağan da-Ji Hebûna Wêjeyî ber bi Lîteratura Akademîk ve Kirmanckî/Zazakî: Diyarî bo M. Malmîsanij, 2020), mijarê zelal dike. Di nivîsê da tê dîtin ku helbestkarê gewre Sey Qajî dibêje, "Bixeleşnîme şerefê Dêsim û Kirmanciye." Helbestkar Wakile dibêje, "Dêsim, welatê Kirmancî yo." Dîsa deyrbaz û helbestkarên wek Silo Qij, Qemero Arayij, Seyîdê Kalî û Xidê Alî Îsme di kilaman da heman navî hildidin. Gotina Hesen Aliyê Sêy Kemalî ku ligel Seyîd Riza ceng kiriye, kurteya mijarê ye: "Ma Kirmancî me, zonê ma Kirmanckî yo, welatê ma Kirmanciya."

Baş e, gellek nivîskar û lêkolerên Kurd çavê xwe her li peyva Kurdistan digerînin, lê çima bala xwe nadine Kirmanciyê/Kurmanciyê? Me mînakên ji Kirmanckî dîtin, gelo di Kurmancî da jî peyva Kirmanciyê/Kurmanciyê heye yan na?

Li vir dixwazim 3 mînak ji Kurmancî bidim. Ya pêşîn ji Kela Dimdimê ye. Di lêkolîn û berhevoka Yaşar Kaplanî da *(Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn, 2019)* ev "sêxiştî"-sêriste bala meriv dikşîne: "Xan, ebdal e li beriyê / D'gerît nanê xulamiyê / Dê bît mîrê Kurmanciyê." Şer û berxwedana Kela Dimdimê di navbera salên 1608 û 1610an da qewimiye. Diyar e ku peyva Kurmanciyê di wê demê da hebûye.

Em peyva Kurmanciyê di *Mem û Zînê* da jî dibînin: "Bifkir ji 'Ereb hetta ve Gurcan / Kurmanciye bûye şubhê burcan." Xanî dibêje, binêre ji warê Ereban heya Gurganê, Kurmanciyê bûye wek burcan. Gellek şarih, lêkoler, wergêr û pispor peyva Gurcan/Gurgan a di vê beyte de wek "Gurciyan", Kurmanciye/Kurmanciyê jî wek "Kurdan" dîtine ku yek ji wan jî ez im -îro şaşîtiya xwe dibînim û dipejirînim.

Xanî li vir jî dubendiyek çêdike; çima wê ya pêşî coğrafya/welat, lê ya diduyan netewe be?

**1.** Di Anabasisa Xsenopohoneî da "Arabia" wek welat hatiye bi nav kirin. Jixwe di zimanên Mezopotamyayê da bo rojavayê Feratê peyva "ereb" dihat bi kar anîn. Yanê ereb, beriya bibe navê neteweyekê warek, deverek, aliyek bû.

**2.** Di elfabeya Aramî da tîpa "g" tune ye, lewra bo Gurganê "Curcan" dibêjin. Gurgan herêmeka li rojhilatê başûrê deryaya Hezerê ye. Xanî dizane ku gellek Kurd koçî Xorasanê kirine û li Gurganê jî Kurd hene. Hetta serokê Cîhanbeglûyan Şukur Begê Kurd, li deverên wek Sebzewar, Cûweyn, Cacerm, Mînûdeşt, Findiqrez, Elîabadê Kutul û Gombedê Kawûs hukim dikir ku qismek jê dikeve nav Gurganê. Yanê ne Curcan Gurcî ne, ne Kurmanciyê Kurd in.

Mînaka dawîn ji helbestkarê xembar Wedaî ye û mijarê bi Xanî û Kirmanciyê/Kurmanciyê ve girêdide. Xanî, bo Mîr Muhemed Pirbela mersiyeyek nivîsîbû bi navê "Kanê Padşahê Serhedan." Wedaî jî bi heman şêweyê mersiyeyek nivîsiye bo Xan Mehmûd, bi navê "Kanê Cihangirê Cihan" (1821). Di mersiyeyê da em Kirmanciyê dibînin: "Wek Mîr nebûn alî himem / D'Kirmanciyê hetta Ecem / Kan leşker û ceyş û heşem / Kane Cihangerê Cihan?"

Mîr Celadet Alî Bedir-Xan demek dirêj peyva Kurdmanc bi kar anî. Qey peyvek çêkirî bû, lê nehat. Lê xuya ye, Kirmanciyê û Kurmanciyê di şûna Kurdistanê da hatine gotin. Ew Kurdistana mişt e bi Kurmancan ku tenê ji xwe ra dibêjin Kurmanc.

# xwebûn

20-26 Tirmeh 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 31

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85




# Kurtan li ber tunebûnê ne

*Di salên dawîn de eleqeya ji bo kurtanan ango cilên keran kêm bûye. Her çiqas eleqe kêm be jî li Amedê kesê bi navê Fesîh Surmelî kurtanan çêdike, piştre dibe gundan û difroşe*

Navenda Nûçeyan

Wek tê zanîn, çanda kurtanan xwedî dîrokeke dûr û dirêj e. Li ser gelek bermahiyên dîrokî, mirov rastî palas ango kurtanên ajalên mîna hesp, ker û qantiran jî tê. Ev çanda ku bi hezaran salan e berdewam kiriye, îro êdî li ber tunebûnê ye. Wekî Fesîh Surmelî di axaftina xwe de gotiye 'êdî tu kes bi vê çandê qayil nabe, ji ber ku êdî di jiyana me de erebe hene.'

Fesîh Surmelî ev 35 sal in kurtanê ker, qantir û hespan çêdike. Surmelî çêkirina kurtanan ji apê xwe hîn bûye. Li Çarşiya Şewitî ya Amedê, berê ermenekî bi navê Yilmazê Gêlî kurtan çêkirine. Li gorî gotinên Fesîh Surmelî li Licê (Pêçarî) jî ermenekî kurtan çêkirine û gelek kes li ber destê wî hînbûne. Berê tenê li Licê10-15 dikan hebûne. Niha li gund tenê yek heye kurtanan çêdike û dişîne bajarokên bajêr û Elezîzê.

Surmelî di her sê mehên havînê de, li dikana xwe ya li Çarşiya Şewitî kurtanan didirû; payîzê jî wan dike paşiya pîkabekê û berê xwe dide gundên navçeyên Mêrdîn, Êlih, Elezîz, Riha û Dîlokê. Fesîh Surmelî, qala çêkirina kurtanan û hin bîranên xwe yên di vê rêwitiyê de, kir.

**Êdî qîma xwe bi wan naynin**

Fesîh Surmelî der barê çêkirina kurtanan de bi lêv kir ku 30-40 sal berê çêkirina kurtanan pir bû lê niha kêm bûye. Berê rojê du-sê heb kurtan didirûtin lê niha di hefteyekê de encax sê heban çêdike. Surmelî sedema vê yekê jî bi jiyana li gundan ve girê da û wiha got: "Berê ji gundan, xelkê ji bo ker, hesp û qantiran kurtan dixwestin. Yanê berê ewqas erebe tunebûn, her tişt li ser pişta ker, hesp û qantiran diçû dihat. Niha pîkap, motorsiklêt û filan tişt di nav gundan de tijî ne, tu kes êdî qîma xwe bi wan nayne."

**Her tişt guheriye**

Surmelî di axaftinan xwe de bal kişand ser guherîna civakê ku êdî ji hin şêweyên jiyanê dûr ketiye û da zanîn ku berê di her maleke gund de ker, qantir an jî hesp hebûn; her maleke gund heywan xwedî dikirin lê êdî ev yek jî nemaye û axaftina xwe wiha domand: "Êdî her kes êzingên xwe bi qamyonan dibe tîne. Kar û barên xwe yên li gundan bi wesayitan dike. Her tişt guheriye. Niha yek tê kurtanekî distîne, têra wî û 10 salan dike lê berê encax têra wî û 6 mehan dikir. Ji ber ku berê karê bostanan, karê li çiyê bi ker, qantir û hespan dihat kirin; barê kerpîç, kevir, êzing û çiloyê li wan dihat kirin ango karên rojane tev bi wan bû. Îja ji ber vê kurtan zû diriziyan. Yanê êdî tu tişt ne wek berê ye."

**Kurtan ji 8 parçeyan çêdibe**

Kurtan ji kincê nav wî heta çîtikê (qamîş), kulav, qayîş û palasê çêdibe. Heşt perçe didin berhev û bi wî awayî kurtan tên dirûtin. Surmelî dibeje ku parçeyek jî kêm be, dê mirov nikaribe kurtanekî bidirû.

Der barê peydekirina palas (rûyê kurtan) û kulavan de jî Surmelî diyar kir ku berê rojê nêzî 20 heb difirotin lê niha ji ber bikaranîna xaliyên fabrîkayan êdî tu kes wan naxwaze. Ji ber wê jî dîtin û anîna palas û kulavan zehmet e.

Em dikarin bêjin ku çanda dirûtina kurtanan, piştî du-sê kesên mîna Fesîh Surmelî dê ber bi xelasbûnê ve biçe. Surmelî xwestiye hînî zarokên xwe jî bike lê zarokên wî fêr nebûne.

## Lawo wele heşayî te

Fesîh Surmelî li gundan digere û carinan rastî hin bûyerên 'ecêb' jî tê. Ka em guhê xwe bidin çîrokeke wî ya ku li gundekî Licê jiyaye: "Li gundan ez bang dikim û dibêjim werin cilê keran, cilê qantiran, cilê beygîran. Rojekê dîsa min berê xwe dabû gundekî Licê. Min hew dît ku xaltiyek derket ber derî û bi dengekî bilind gote 'tu kîloya kartolan bi çi didî?' Min jî bi ken jê re gote, xaltî ev ne kartol in, cilê keran e. Îja xaltî ji min re gote 'lawo wele haşayî te, min gotiye qey tu kartolan difiroşî.' Rojeke din jî ez dîsa li gundê Ewêna min ji bo firotinê kurtan digerandin. Wan rojan jî ji ber ku hinekî barê min giran bû, hevalekî min (Niyazî) jî alîkarî dida min. Dîsa yek ji malekê derket gote 'birayê min ew çi ye tu difiroşî?' Min jî got wele cilê keran e. Jinekê jî got 'wele kerekî min heye lê niha li ba şivan e.' Min jî got 'gelo kerê te hûr e gir e çawa ye?' Ew ê jî got 'wele ez nizanim ker ne li malê ye.' Min jî îja berê Niyazî da xaltiyê û min bi henekî got ka em kurtan li Niyazî bikin ku lê were dê ji bo kera te jî baş bibe. Em tev dîsa bi hev re keniyan."

# Tovên firengên bejî

Derya Ozdemîr

Balîf, nivîn û lihêfên bi cawên saten, qedîfe, carso û bi neqş û kulîlkên hûregir û rengorengoyî lê rengên çilmisî û cawên maşiyayî li ser rê û li nav zeviyan belav bûne. Kincên di nav boxçe û tûrên şekiran de, şewqeyên nav û reklamên fîrmayan li ser, xavik û destmalên wan weke hebên şekiran belav bûne û li ber bayê ba dibin. Teştên lokî yên kincan, misîn, çaydank û firaxên hêsin li wan erdan belav bûne, kulbikê avbacanan û penîr qulibîne. Nanê zuha şikestiye; şekir, çay, birinc û savar tevlîhev bûne û rijiyane. Her liba kartol û pîvazan çûne derekê. Her laşekî zarok, jin û zilaman jî li ser rê, li nav zeviyan û hinek jî di seyarê de mane. Nalîn û giriyên zarok û mezinan tevlîhev bûne, hawara saxan e. Dayik û bav tevî birînên xwe, xwe bi erdê re dixuşînin da ku bigihîjin zarokên xwe, ka sax in an jî mirî. Seyareya lê siwar bûyîn qulibiye, konê wan û hesinê konên ser seyarê hatî girêdan jî filitiye û ketiye ber rê; pêşiya seyarê pelixiye û dû jê radibe. Dengê qorneyên seyareyan, dengê ajokaran, nirçenirçên kesên li wan nasekinin û di ber wan re diborin bêyî ku alîkarîya wan bikin, derbas dibin lê hinekên dilbirehm li wan disekinin, dest davêjin telefonan gazî ambulansan dikin da ku bilez werin; qeza qewimiye.

Ji ber buhabûna heqê seyare û ajokaran ji hemdê seyareyan zêdetir lê siwar dibin û tiştan lê bar dikin. Pir caran bi rêyên hê temam nebûyîn û di rêyên asê re wan dibin. Ezabê cihê diçinê jî ne kêmî ezabê di rêyan de dijîn. Di wan konan de hemû malbat tevî zarok û pitikên xwe; hin caran di sir û seqeman de dicemidin hin caran di hewayên zêde germ de dişewitin û hin caran li ber lehiyan dikevin. Di van şertan de piranî bê ceyran, bê sarinc, bêyî ava hênik dimînin. Pir caran tiwalet û cihê serşûştinê nîn e û mecbûr in avê jî ew bînin.

Pereyên ku distînin kêm e lê bi xwînmijiya elçî û çawîşan ve jî kêmtir dibe, ew jî ji her kesekî herî kêm 6-8 TL'an ji yewmiya wan dibirin. Ji bo debara xwe ya zivistanê bikin tevî zarokên xwe yên şeş-heft salî jî dixebitin lê piranî yewmiya wan nayê hesibandin. Li gorî kaxizên cem mixtaran dema xebatê 12 saet in lê xwediyê erdan, elçî û çawîş wan 14-15 saetan dixebitînin. Kesên şert û mercên wir û dema xebatê qebûl nekin jî, ji wan re dibêjin ku nayê hesabê we konê xwe rakin û herin.

Trajediyên karkerên çandiniyê tenê ne şert û mercên fizîkî ne. Jin û zarokên wan ji aliyê niştecihên wê derê rastî destdirêjiyê û tacîzî jî tên. Hin caran hinek xwe şaş dikin û keçên xwe bi wan re dizewicînin lê an piştî salekê an jî beriya sal temam bibe an heml an jî bi pitikên wan re wan keçikan li ser rêya mala bavê wan kar dikin û berdidin. Zilamên wan dema ji bo pêdiviyên malê temam bikin biçin sûkê an jî dema dixebitin, ji bo ku kurdî xeber dane an jî stranên kurdî guhdar kirine rastî êrîşên faşîstan tên bi awayekî hovane carinan tên kêrkirin carinan heta mirinê lêdanê dixwin.

Qeza qewimiye. Êvarê di nûçeyan de bi çend kêliyan û çend hevokan behsa wan tê kirin. Karkerên çandiniyê yên ji bajarê '.........' ji bo karê (kartol, şekir, fireng, pirteqal, mijmij, hêjîr, bindeq, bostan û hwd.) hatinî li bajarê '.........' qeza kirin. ..7, 8, 10, ..15..20...mirî, 7, 8, 10, ..15..20, 25 birîndar. Ew valahiya jor a yekemîn teqez bajarekî Kurdistanê ye û valahiya duyemîn jî bajarekî aliyê tirkan e. Û ew tenê hejmar in ji bo nûçeyên tirkan, ne behsa şert û mercên wan tê kirin ne jî behsa wê faşîzma xwerû.

Di pirtûka "Li Ser Sifreya Rojê De" birêz Elî Haydar Kaytan behsa biranîneke xwe ya bi birêz Abdullah Ocalan re dike. Abdullah Ocalan dipirse û dibêje: "Rojekê şoreş pêk were û tu bibî xwedî zarok, tu yê çend zarokan çêkî?" Elî Haydar Kaytan dibersivîne û dibêje: "Yazdeh." Birêz Ocalan heyîrî dimîne û dibêje: "Çima?" Ew jî dibêje: "Em kurd wekî tovên firengên bejî ne. Firengên bejî hundirê wan tijî tov e, hin tovên wan ji ber bêaviyê hişk dibin, hinek li ber bayê diçin, hinek jî kurm û kêzik wan dixwin, dawiya dawî du sê heb dimînin da ku xwe bigihînin sala bê."

Em kurd jî weke tovên firengê bejî ne, bi rastî jî. Trajediyên me jî bi qasî nifûsa me ne. Behsa 40-45 mîlyon nifûsa kurdan tê kirin lê kurd li her derî her roj û kêliyan tê kuştin. Mêtingeriya li ser axa Kurdistanê her roj dibe sedemên trajediyên nû. Kurd her roj li ser axa xwe ji aliyê dagirkeran ve tên bombekirin, li ser axa xwe ya bi sînorên çêkirî û mayînkirî di bin navê kolberî û qaçaxiyê de tên kuştin. Diçin seyranê tên kuştin; di nav zeviyên xwe yên çandiniyê de tên kuştin; li ber mala xwe di bin siyên darên xwe de li hewşê tên kuştin; diçin ber pezê xwe li zozanên xwe tên kuştin; bi erebeyan rê diçin, tên kuştin. Li hember dewlemendiya xweza û erdnîgariya xwe, ji ber xizaniyê di karên dagirkeran de, di înşaatan de, weke karkerên çandiniyê di qezayan de, di êrîşên faşîstî de tên kuştin û carinan jî li hemberî ewqas hezkirinên axa xwe li sirgûniyê li dîasporayê carinan bi qirîzeke dil carinan bi guleyekê tên kuştin. Û yên li dû kuştinan dimînin... Xwedê ewqas êş bida kevir û çiyayan niha nediman lê em kurd tovên firengên bejî ne bi du sê heban be jî em ê bimînin sala bê.